Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1140 | 4-Sibat- 2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

## Hunermendên Çemçemalê, xaniyek vedigerînin navenda hunerê



Komek ciwanên hunermend ên Navenda Hunerê ya Çemçemalê ji bo pêşxistin û belavkirina hunerê, xaniyek kevin girtine dest û nûjen dikin. Hunermendan bang li hunermendên din kirin ku hevkariya wan bikin û wiha gotin: "Armanca me jî ewe ku em bikin navendek mezin ya çandî û hunerî ya bajarok da ku hemû hunermend bikarin kar û çalakiyên xwe li vir pêkbînin."

Dema em di bajarê Çemçemal re derbas dibin, em li malekê disekinin ku di salên 1940'î de wek nexweşxane dihat bikaranîn, ev nexweşxane heta sala 1980 xizmet li herêmê dikir. Piştre bû pirtûkxane û piştî wê jî di warê hunerî de hate bikaranîn. Lê di sala 2005'an û şûn ve hate valekirin û ev xanî ji hestên hunerî bê par ma.

Hinek hunermendên Çemçemalê li ser navê Navenda Hunerî ya Çemçemalê bi armanca giringî dayîna çand û hunerê biryar dane ku êdî vê xaniyê veguherînin û nûjen bikin da ku bikeve bin xizmeta xebat û çalakiyên cuda yên hunerî de. Hunermendên ku beşdarî xebata nûjenkirina xaniyê bûne di derbarê mijarê de ji Rojnews'ê re axivîn.

Yek ji endamên Navenda Hunerî ya Çemçemalê Şanoger Awat Celal wiha dest bi axaftina xwe kir: "Nêzî sê mehin navenda me hatiye avakirin, ji bo ku avahiyek hebe û xebatên wê bi pêş bixin gelek xebat hatin kirin. Niha me ji bo vê yekê li vî xaniyî kar dikin û nûjen dikin. Armanca me jî ewe ku em bikin navendek mezin ya çandî û hunerî ya bajarok da ku hemû hunermend bikarin kar û çalakiyên xwe li vir pêkbînin."

Navenda Hunerî ya Çemçemalê nêzî 3 mehin ji aliyê komek ciwanên xwedî jêhatin ve hatiye damezrandin û ji beşên wênesazî, mûzîk û şanoyê pêktê. Zêdetirî 70 endamên wê hene û di sala 2023'an de li Îran û Bexdayê du xelat standine.

Wênesaz Aram Mihemed ku endamek din ê Navenda Hunerî ya Çemçemalê de di derbarê heman mijarê de axivî û wiha pê de çû: "Me komek ciwanên hunermend biryar dan ku navendek ava bikin ku bibe mala hunermendan. Em bang li hunermendên din jî dikin ku hevkariya me bikin da ku ev cih li Çemçemal hîn zêdetir xizmetê ji hunerê re bike."

## Gelo ma pêkan e ku mirov li ser erdê hişk ê Heyvê çandiniyê bike?



Komeke lêkolînvanan li Çînê, li cihekî ku dişibe rûerda heyvê şînkahî çand. Derket holê ku xaka bi navê regolît a li ser Heyvê, wê bi saya sê curên bakteriyên cuda bi berhem bibe. Hat nîşandan ku wê bi saya van bakteriyan li ser Heyvê şînkahî bên çandin. Ev yek ji bo wezîfeyên dem dirêj ên Heyvê weke gaveke xurt dixuyê.

Li Çînê komeke zanîngeha çandiniyê, ji bo ku xaka Heyvê ji bo şînkahiyan bi berhem bibe, xebat meşandin. Ev xebat di kovara Communîcatîons Bîology de hate weşandin. Komê ceribandin li ser Nîcotîana Benthamîana ku nêzî tutunê ye, kir û encamên serketî bi dest xist.

Zanyaran sê curên bakteriyan ên bi navê Bacillus mucilaginosus, Bacillus megaterium û Pseudomonas fluorescens bi kar anîn û kîmyewiya xaka Heyvê guhertin. Bi vî rengî fosfora ku ji bo şînkahiyan pêwîst e û li ser xaka Heyvê kêm e, bi dest xistin.

Di lêkolînên zanyarên Emerîkayî de sala 2022'an hatibû nîşandan ku xaka Heyvê dikare ji bo şînkirina şînkahiya Arabidopsis thaliana were bikaranîn. Lê ev xak ji bo mezinkirina şînkahiyê bi kêr nehat. Azot û fosfor kêm bûn û ev yek jî li pêşiya xebatan dibû yek ji astengiyên herî mezin.

Lêkolînervanên Çînî di encama xebatên ku bi B. mucilaginosus, B. megaterium P. fluorescens hatîn kirin, dîtin ku mîqtara fosforê bi rêzê ve di rêjeya ji sedî 214, ji sedî 234 û ji sedî 247 zêde bûye. Li ser xaka ku 3 bakterî bi hev re hatin bikaranîn jî, di şînkahiyan de li gorî regolîteyê ji sedî 104 hîn bêhtir konsantrasyona kolorofîl, kokên hîn dirêjtir, gewde û pelên hîn firehtir hatin tespîtkirin. Ev encam ji bo astro-cotkarên siberojê jî, hêvî ye.

## Li Danîmarkayê yekem şopa nivîsê li ser kêrekê hat dîtin

Muzexaneya Odenseyê ya Danîmarkayê, roja Sêşemê ragihand ku arkeologan kêrek piçûk ku 2 hezar sal berê hatiye çêkirin û li ser nivîsa rûnîkî heye dîtine.

Arkeolog Jakob Bonde yê ku kişfê dikedaxuyanî da AFP'ê û got: "Kêr bi xwe balê nakêşe, lê li ser kêrê pênc rûn hene ev bi tena serê xwe tiştekî balkêş e. Ji ber ku ew li Danîmarkayê yên herî kevn in, lê temenê rûnan hîn mezintir e."



Kêr, di derdora Beriya Zayînê 150'î de hatiye çêkirin, di goristanek piçûk a rojhilatê Odenseyê de hate dîtin. Pênc tîpên wê hene û li gorî axaftina wê demê ya Proto-Norseyê, tê wateya "şûrê piçûk".

Jakob Bonde got: "Ev peyamek ji paşerojê ye. Ew fersendê dide me ku em baştir lêkolîn bikin ka zimanê herî kevnar ê naskirî li Skandînavyayê çawa pêşketiye û mirov çawa bi hev re têkilî danîne."

Bonde axaft"ina xwe wiha domand: "Xwediyê ku ji kêra xwe ya piçûk re digot 'şûrê piçûk', belkî dixwest nîşan bide ku ew şervaneke an jî dixwest bibe şervanek.

Arkeolog diyar dikin ku di sala 1865'an de qiloçeke hestî ya biçûk a bi nivîseke rûnî hatiye keşifkirin û ew jî ji heman serdema kêrê ye. Arkeolog daxuyandin ku di rojên ewil de dema ku li Skandînavyayê dest bi bikaranîna nivîsandinê kirin bi piranî li ser tiştan tenê nivîsên piçûk hebûn û wiha pêde çû, "Mînak pirtûk û nivîsên mezin li ber destên me tunene."

Kevirên rolyef ên Jelling ku di sedsala dehemîn de hatine çêkirin, xwedî nivîsên dirêjtir in.

### Sudoku: Bersiv 51

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 2 | 9 | 5 | 1 | 7 | 3 | 6 | 4 |
| 1 | 5 | 3 | 6 | 4 | 2 | 9 | 8 | 7 |
| 7 | 4 | 6 | 9 | 8 | 3 | 1 | 5 | 2 |
| 9 | 7 | 5 | 2 | 3 | 1 | 8 | 4 | 6 |
| 2 | 8 | 1 | 4 | 9 | 6 | 7 | 3 | 5 |
| 3 | 6 | 4 | 7 | 5 | 8 | 2 | 1 | 9 |
| 4 | 1 | 2 | 8 | 6 | 9 | 5 | 7 | 3 |
| 6 | 9 | 8 | 3 | 7 | 5 | 4 | 2 | 1 |
| 5 | 3 | 7 | 1 | 2 | 4 | 6 | 9 | 8 |

### Sudoku:Pirs 52

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | 8 | | 5 |
| | | 8 | | | 5 | | 6 | |
| 2 | 5 | 7 | | 4 | | 9 | | |
| 6 | 1 | | 3 | | | 2 | | 7 |
| | | | | | | | | |
| 8 | | 9 | | | 1 | | 4 | 6 |
| | | 6 | | 9 | | 7 | 8 | 3 |
| | 3 | | 4 | | | 5 | | |
| 9 | | 2 | | | | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Li kerê mirî digere da nalan ji xwe re jê veke:**
- Dixwaze bi xapandina mirovan xwe dewlemend bike; ti kes bi awayê wî nikare dewlemend bibe.

**Ling lê qulibandin:**
- Xapand.

**Li pengara wî ketiye:**
- Li dû ketiye; li pey çûye; pê hatiye xapandin.

**Li ser tiliya xwe dileyzîne:**
- Pir bi hêsanî dixapîne.

**Li ser tiliya xwe ve dide lîstin:**
- Dixapîne; ji xwe re bi kar tîne.

**Ma min ev por li êş spî kiriye:**
- Tu nikarî min bixapînî.

**Ma min ev rûyê xwe di aş de spî kiriye:**
- Bi heman wateyê.

**Me got em herin mala apê xwe firo firkin, me negot em herin guliyan kurkin:**
- Em ne ji bo xirabiyê hatibûn.
- Ez nayêm xapandin; ez wisa ne xeşîm im.
(Dema yek dixwaze yekî bixapîne, yan tiştên di dilê xwe de nebêje yê din wisa jê re dibêje)

**Min ev ser ew ser neke:**
- Min mijûl neke; min nexapîne.

**Min darajo bi bavê te re kiriye:**
- Ez hevalê bavê te me; tu nikarî min bixapînî; ez xwedîtecrûbe me.
(Berê ciyê riya erebeyan lê neyî gundiyan darên xwe yên spîndar di avê de berdidan heta digihandin ser rê. Ji wî karî re digotin darajo)

**Miriyan tazî dike:**
- Karê wî tev derew, hîle û xapandin e.

**Neket qoçê:**
- Nehat xapandin.
Pê lîst: Xapand; xiyanet lê kir; pê re ne rast bû.
Pê kenî: Xapand.
Pişta wî girê dan: Xapandin; bi tiştekî ve mijûl kirin.

**Pişopişo kir/pişopişo pê kir:**
- Pesnên wî dan heta ku xapand; bi nermayî pê re axivî heta ku xapand; bi devnermî pê re axivî heta ku karê xwe pê da kirin.

**Ser de tasek ava sar vexwar:**
- Hat xapandin; hêviya xwe jê birî; êdî tiştekî ku bikare bike nema.

**Ser serî de tasek ava sar rêhtin:**
- Hat xapandin û nikarî tiştekî jî bike.

**Serê wî tijî kir:**
- Xapand; kar pê da şîrînkirin.

**Serê wî germ kir:**
- Bi heman wateyê.

**Serê wî girê dan:**
- Bi tiştekî ve mijûl kirin; xapandin; karek dan pêşiyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Viyan sembola azadî û fedekariyê ye



Viyan Soran ji bo şermezarkirina tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan di 2'ê Sibata 2006'an bedena xwe da ber agir û li dora azadiyê xelekek ji agir û pola ava kir. Viyan Soran bi van gotina behsa armanca çalakiya xwe ya fedayî kir: "Çalakiya min bersivek ji siyaseta înkarê ye."**R-2**

## Barîn Kobanê bû sembola berxwedanê

Barîn Kobanê bi lehengiyeke mezin cihê xwe di Berxwedana Serdemê de girt û bi têkoşîna xwe pêşengtiya jinên Kurd ên azadîxwaz di dîrokê de neqişand.R-2



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1140 | 4-Sibat- 2024 | www.ronahi.net/ku/

# HETA KU RÊBER APO AZAD BIBE WÊ MEŞA AZADIYÊ BIDOME

Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan "Meşa Dirêj a Azadiyê" ya 25 rojan li banliyoya Villeneuve Saînt Georges a paytexta Fransa Parîsê hatibû destpêkirin, her roj li bajarekî nû pêk tê û meş di roja xwe ya 14'an de berdewamdike. Herwiha li Bakurdê Kurdistanê jî "Meşa Mezin a Azadiyê" ji bona heman mebesê hatibû destpêkirin di roja 4'an de bi coş û kelecaneke mezin berdewam dike û heyanî azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêkwere wê gel di nava kar û xebatê de be.**R-5**




## Şaredariya Gel xizmetkara civakê ye

Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Amûdê Ferhan Derwîş diyar kir ku ji sala 2013`an ve û heta niha Şaredariya gel a bajêr ji bo xizmeta civakê û rêxistinkirina bajêr gelek kar û xebatan dide meşandin. Herwiha di sala bûrî de wan 6 pirojeyên xwe qedandin.**R-6**

## Civînên Asîtanayê wê tu carî nebin cihê çareseriyê!



Kirîza Sûriyê her ku diçe kûrtir dibe. Hêzên navneteweyî û herêmê qaşo ji bo dîtina çareseriyê bi 10'ê caran li Asîtana, Cinêv û Sûtşî civînên berfireh li dar dixin, lê ji ber ku ev hêz ji bo berjewendiyên xwe kar dikin û nûnertiya gelên Sûriyê nakin, tu çareserî peyda nabe, tersî wê hin hêzên wekî dagirkeriya Tirk bi kiryarên xwe dixwazin kirîzê gurtir bikin. **R-4**

## Armanca sereke pêkanîna Mîsaqa Milî ye

Dewleta Tirk a dagirker ku xwe li ser xwîna gelên herêmê yên resen daye avakirin, ji bo pêkanîna planên xwe yên dagirkiriyê hewil dide tevahiya gelên herêmê qir bike. Ji Sûriyê bigre heta Iraqê dagirkeriya Tirk komkujiyan pêk tîne û bi hemû hêza xwe hewil dide Mîsaqa Milî pêk bîne.**R-5**




Idrîs Henan
**Hemû rê diçin Îmraliyê** *R-5*


Hafiz Ahmet Turhalli
**Dewleta Tirk û mela** *R-6*


Sîpan Şînda
**Mêtîngerî** *R-7*

# Barîn Kobanê bû sembola berxwedanê

Barîn Kobanê bi lehengiyeke mezin cihê xwe di Berxwedana Serdemê de girt û bi têkoşîna xwe pêşengtiya jinên Kurd ên azadîxwaz di dîrokê de neqişand.



**Deriya Çiya/Qamişlo**

Dişoreşa Rojava de ku bi navê 'şoreşa jinan' tê naskirin, gelek jinên berxwedêr berxwedana xwe derbasî nava rûpelên şoreşê kirin û li ser rûyê erdê parastina jin û civakê kirin. Yek ji wan jinan jî Barîn Kobanê ye bi êrişên dagirkeran ên li dijî Efrîn re, gelek çîrokên têkoşîna li dijî dagirkeriya dewleta Tirk ketin nava rûpelên dîrokê. Barîn Kobanê jî berxwedana xwe li navçeya Bilbilê ya Efrîn pêk anî.

### Jiyana Barîn Kobanê

Barîn Kobanê di sala 1994'an de li gundê Qern Kelbîn ê herêma El-Bab a gundewarê bakurê Helebê ji dayik bûye, tevî malbata xwe li bajarê Kobanê jiyaye, xwendina xwe ya navîn neqedandiye. Dema ku hêzên terorîst ên DAIŞ'ê derbasî herêma Kobanê bûn, malbata wê rastî tacîz û gefan hat, bavê wê revandin. Ji bo berdana bavê xwe fidye dan, malbata Barîn neçar ma koçî kantona Efrînê bikin.

Di raporekê de tê gotin ku şehîd Barîn beriya ku biçe şer wiha gotiye: "Berî ku ez tevlî Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê bibim min tiştek li ser cîhana siyaset û têkoşîna leşkerî nizanibû, lê piştre min fêm kir ku azadiya min bi azadiya welatê min re dest pê dike".

### Piştî ku êşa jinên êzidî dît tevlî nava şervanên YPJ'ê bû'

Di sala 2013`an de çeteyên DAIŞ`ê derbasî gundê Barîn Kobanê dibin. Barîn tevî malbata xwe ji gund koçber bûn û li Kantona Efrînê bi cih bûn. Piştî ku Barîn Kobanê jinên êzidî yên ku ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve li Şengalê hatibûn revandin, dibîne ku wan jinan xwe ji nava destê çeteyên DAIŞ`ê rizgar kiribû û xwe gihandibûn herêma Efrînê ya ewle. Piştî komkujiya Şengalê, sûîqast û dîlgirtina jinan, Barîn di bin bandora van komkujiyên li dijî jinên Êzidî de ma. Ji bo tolhildana wan bi dilxwazî di sala 2014'an de tevlî YPJ'ê bû. Tevlîbûna wê ya YPJ'ê piştî ku çeteyên DAIŞ'ê gundên wan Qer Kebîn a herêma Babê dagir kirin pêk hat. Lewma wê demê wateya parastina xaka xwe û bi gelê xwe re rawestiya, feraset û nirxên azadiya demokratîk pêk anî û li Kobanê û Reqayê li dijî DAIŞ'ê şer kir. Bi destpêkirina êrîşên Artêşa Tirk û çeteyên wê ya li ser Efrînê ku di 20'ê çilê destpê kir, Barîn wekî hezaran şervanên jin cihê xwe di Berxwedana Serdemê de girt û tevlî berxwedana li dijî Artêşa Tirk û çeteyên wê bû.

### Şehadeta Barîn Kobanê

Barîn bi hemû cesareta xwe di 2'ê Sibata 2018'an de di 23'ê saliya xwe de li Efrînê, bi çalakiyekê li gundê Qornê ya navçeya Bilbilê çembera ku dewleta Tirk û çeteyên wê li ser komek hevalên wê pêk anî şehîd bû. Piştî şehadeta wê çeteyên dewleta Turk bi awayekî hovane bi laşê wê lîstin û wêneyên laşê wî yê perçekirî ku li ser torên civakî ji aliyê çeteyên Tirkiyê ve hatin weşandin, ev wehşiyet li tevahî cîhanê deng veda. Barîn di çalakiya xwe ya qehremanê de karîbû çemberê li ser hevalên xwe bişkîne. Barîn bû sitûnê tekoşîna Berxwedana Serdemê û bû hêviya hemû jinên azadîxwaz ên Rojhilata Navîn, êdî Barîn ji bona cîhanê tevahî bû sembola tekoşîn û berxwedanê.

### Mijareke ji hovîtiyê wêdetir

Dema ku ferd di civakên xwe de dibin sembol, ev tê wê wateyê ku ew ji bîreweriya asayî ya ku ji bo aktîvkirina wê pêwîstî bi teşwîqkeran heye, derbas dibe, ji ber ku ew ji bo mirovên civakê dibin nimûne û wateya rastîn a jiyanê ev e. Barîn Kobanê jî navekî bêmirine. Ji ber ku ew bû sembola tevahî jinên jîhanê.

Girêdayî hovîtiya ku li ser jinan tê kirin Hani Al Dhaheri li ser malpêra Navenda Rojnamegeriya Bêsînor nivîsî: "Ev hovîtî di cîhana nûjen de ji bilî navê xwe yê rast nikare cihê lingê xwe bibîne, weke komkujiyên ku giyanan nefret dikin û laş dişewitînin. Ji ber vê yekê ya ku ew difikire îro hilgirê zihniyeta hovane ya kevin di şerekî ku bi zimanê serdemê windabûn e. Têkçûneke exlaqî ye û derketina heqaretê ye ji deriyê piştê mirovahî û cîhana şaristanî."

Gotara rojnamevana Tûnisî Assia Al-Atros ku di 6'ê Sibata 2018'an de di rojnameya "Raî El-Yûm" de bi sernavê "Laşê Barîn Kobaniyê…an Bermahiyên Welatan di Mezadê de" hatiye weşandin. Tê de wê got: "Berî her tiştî, ez qebûl dikim ku min cesareta şopandina bûyerên vîdeoyek hovane ya komeke ji Cinawirên ku cil û bergên mirovan li xwe dikin jî nîn e. Cenazeyê Barîn Kobanê şehîda bêhiqûqiya edaleta bêhêz a navneteweyî ji teşhîsa nexşeyê pê ve ne tiştekî din e. Ji cîhana me ya erebî.

Rojnamevan Asya zêde dike, "Vîdyoya belavbûyî ya termê şervana Kurd ya ku hatiye destdirêjîkirin, hema rastiya tevahiya herêmê radixe ber çavan. Piştî ku ketiye ber destwerdan û hesabên hevrikên xwe. Barîn Kobanê şervana ku laşê wê ji aliyê deh çeteyê ji bo destdirêjiyê kom bûne, tenê yek ji wan dîmenan e ku hovîtiya mirovan piştrast dike. Helbet Operasyona dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ji berpirsiyariya tiştên ku qewimîn nayê dûrxistin û di rastiyê de ev berpirsiyariya ku ji sînorên biryara Tirkiyê ya destwerdana li Sûriyê derbas dibe, ku îro bûye navenda dagirkeriya piralî û bazariya ku li ser pêşeroja gelan tê kirin.

# Viyan sembola azadî û fedekariyê ye



**Navenda Nûçeyan**

**Viyan Soran ji bo şermezarkirina tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan di 2'ê Sibata 2006'an bedena xwe da ber agir û li dora azadiyê xelekek ji agir û pola ava kir. Viyan Soran bi van gotina behsa armanca çalakiya xwe ya fedayî kir: "Çalakiya min bersivek ji siyaseta înkarê ye."**

### Viyan Soran bû çirûska têkoşîn û azadiyê

Şehîd Viyan Soran di sala 1981'ê de li bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê di nava eşîra Caf ku mezintirîn eşîrên Başûrê Kurdistanê ye, ji dayik bû.

Viyan Soran da ku xwedî li hebûn û nasnameya xwe derkeve, her wiha ji pirisgirêkên civakê re bibe bersiv, sala 1997'an xwendina xwe ya amadeyî berdide û biryara tevlîbûna nava refên Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê dide.

Şehîd Viyan di çarçoveya pêngava "Hûn nikarin roja me tarî bikin", li hember kompoloya navneteweyî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan bedena xwe kir xelekek ji agir û siyasetên çewisandin û zilmê yên li ser gelê Kurd, têk bir.

Viyan Soran bi gotina "Ez dixwazim daxwaza xwe ya azadiyê pêk bînim" hezkirina xwe ya di nava Tevgera Azadiyê de diherikîne û dibe çirûska rêya têkoşînê.

### Di buhara temenê xwe de tevlî tevgera azadiyê dibe

Dema ku Viyan tevlî Tevgera Azadiyê dibe temenê wê 16 salî bû. Piştî ku salek di ser tevlêbûna wê re derbas dibe, weke fermandareke pêşeng ya YJA- STAR'ê dest bi kar dike. Di asta rêveberiyê de gelek erk girtin ser milê xwe. Di sala 2004'an de cihê xwe di komîteya jinûveavakirina PKK'ê de girt. Ji bo ku planên hêzên komploger vala derbixe, di 2'ê Sibata 2006'an de bi biryardariyeke xurt bedena xwe ya ciwan dide ber agir û planên komplogeran vala derdixe. Ew bi hemû hêz û zanebûna xwe ji bo azadiya Rêber APO û gelê xwe yê blindest çalakiya fedayî li dar dixe û navê xwe di rûpelên zêrîn ên dîrokê de dineqişîne.

### 'Çalakiya min bersiva siyaseta înkarê ye'

Pêşenga Tevgera Azadiya Jinên Kurd Viyan Soran beriya çalakiya xwe nameyek nivîsand û sedemên lidarxistina çalakiya xwe vegot. Viyan Soran di nameya xwe de behsa guhertinên di kesayeta xwe ya piştî tevlîbûna Tevgera Azadiya Kurd de kir û ji malbata xwe xwest ku piştgiriyê bidin tevgerê.

Di nameya xwe de wiha gotibû; "Ev çalakiya min bersiva siyaseta înkarê ya ku li ser gelê Kurd tê meşandin û tecrîda girankirî ya ku li ser Rêber Apo tê meşandin. Ger li hemberî zilm û zordariyê ku li ser gelê Kurd tê meşandin û ji bona pêkanîna azadiya gelê Kurd û jinên Kurd tiştekî ji canê min bi qîmetir hebûya, minê ew jî bida.Mîna gelek hevalan ez jî xwe deyndarê gel û jinên ku êşê dikşînin dibînim".

'Tevlî têkoşînê bibin'

Viyan Soran di nameya xwe de xîtabî malbata xwe kir û ev tişt anî ziman: "Hûn ji gelên xwedî felsefeya têkoşînê ya li ser heqîqetê ne, 'şêr şêr e, çi jin, çi mêr e'. Ji ber vê yekê divê hûn beşdarbûn û hebûna bi îrade ya jinê ya di çareseriya pirsgirêka netewî de weke şerm û şerefê nenirxînin. Divê êdî nekevin pey aliyên paşverû û kevneşopî yên civakê û li xwe mikur bên ku jin hebûneke civakî ye. Ji ber ku qebûlkirina jinê weke mirov erêkirina vîna civak û gel e. Ger ne wisa bûya, dê jiyan ne temam be. Niha dem hatiye ku hûn biryar bidin. Divê hûn dîrok, berxwedan û lehengiya gel û mirovahiyê biparêzin û weke her kurdekî birûmet û durust hûn jî bibêjin em jî hene û em ê bi qasî hêza xwe xizmetê bikin."

### 'Hêvî û coşa min pir bilind e'

"Viyan Soran di nameya xwe de ji bona Rêber Apo got: Min dixwazim vê yekê bibêjim, hêvî û coşa min gelek bilind in, bi taybetî dema ku we navê min anî ziman û pirsyarek li ser diyarkirina komîteya ji nû ve avakirina Partiya Karkerên Kurdistanê ji min kir, min hîs kir ku we xelata herî mezin daye min. Ez vê yekê weke şerefeke mezin dibînim. Nêrîna we ya li ser Şoreşa Başûrê Kurdistanê ku we weke "Jinên Şoreşger di min de coşeke bilind ava kir û cesaret da têkoşîna min.

### 'Ger hûn bawer bikin, hûn ê bigihêjin armanca xwe'

Di beşa ku Viyan Soran ji Rêber Abdullah Ocalan re nivîsandiye, wiha gotiye: "Rêberê min; Ji roja ku min navê te bihîst û tu naskirî, min jiyan hîs kir, min wê demê zanî ku ez kî me û divê ez çawa bijîm. Ji ber vê yekê ramanê te ez bi tevgerê dame naskirin û ez fêrî jiyaneke watedar kirim. Te ez hînî alfabeya azadiyê kirim. Di dibistana we de her çiqas zehmetiyên min hebûn jî, ez qet dudilî û poşman nebûm. Ji ber ku min di dibistana we de hêza wate, raman û mirovan nas kir. Bi kêmanî min nas kir ku tiştekî ne gengaz nîne û heya ku mirov li ser armancê xwe cidî û bawer be wê bigihêjiye. Weke jin û Kurdekê armanca min azadî bû û min ji dil û can bi vê armancê bawer kir. Ji ber vê yekê ez bi hesreta xwe dixwazim ku we ji nêz ve bibînim, heta kêliyekê jî we hembêz bikim, bêhna xwe bidim ser milê we û paşê bi we re li ser azadî, jin û gelê xwe çi di dilê min de ye bi we re parve bikim."

### "Ez dixwazim deyn û xêrên we vegerînim"

"Niha jî di nava vê bêdengiya mirinê de li başûrê Kurdistanê û weke jineke başûr, ez dixwazim kêmekî be jî ji bona ked û xebata ku we ji bona jin û mirovahiyê kirî bibim bersiv û ez gelekî kêfxweş im ku bigihêjim armanca xwe. Di dawiyê de ez silav, hezkirin û hesreta xwe ya ji dil pêşkêşî we dikim û ji bîr nekin ku em bi hesreta dîtina we ne".



# Pêşveçûna zanistî ya Kurdan

Bipêşxistina zanistiyê ji aliyê zanistvanên Kurd ve; Bêguman xwezaya Kurdistanê, ji berê û pêş ve xwezayeke wisan geş û xweş bûye ku hertim zanist û şaxên wê tê de geş bûne û berepêş çûne. Tê dîtin ku di kûrahiya dîrokê de herdem zanistvan ji nava Kurdan derketine û di gelek waran de zanist bi pêş ve birine.

Di van demên dawiyê de Sosyologê Fars Elî Şerîetî (1933-1977) li ser xebata zanayên Kurd rawestiyaye û gotiye: Şaristaniya Yewnanê koka xwe digehîne zanayên Kurd.

Ji dema Kurdên Gutî û Împeratoriya Medê heta dema Îslamiyetê jî, zanistvanên mezin ji Kurdan rabûne, xasma jî di Serdema Zêrîn a Îslamê de pir têne dîtin.

### Tabletekî Gutiyan, Bi zimanê Akadiyan ve nivîsandîye

Muzîkologê bi navûdeng Ziryab têla 5'an li ûdê zêde kir û yekem car bi pirtikekî êlo li ûdê da. Wî bandoreke mezin li muzîka Spanya kir û weke damezrênerê kevneşopiya muzîka Endulusî tê nasîn.

Dîneweri, (z. 815- m. 896) di Sedsala 9'an de li ser astronomiyê, girtina berê rojê, lajwerd, riweknasî, erdnîgarî, matematîk, dîrok û wekî din pir xebat kiriye û pirtûk nivîsiye. Pirtûka wî ya herî navdar Kitab el-Nebat e li ser Riweknasîyê ye û 8 cîld e, ji ber wî yekê weke "Bavê riweknasiyê" tê nasîn.

Dîneweri xwediyê Çavdêrîya astronomiyê bû ku ew çavdêrîya nêzikî du sed sal hatiye xebitandin.

Bruno Silberberg (Lêkolînerê Alman) ji bo Dîneweri dibêje; Piştî lêkolînên hezar salî, bêhtir ji pirtûkên Dîscorides û Teofrastos yên Grêkan sûd dihate wergirtin. Lê di vê mijarê de berhema Dîneweri ji aliyê agahî û naverokê ve berfirehtir e. Dîneweri ne tenê aliyê nebatan yên xuya dike, aliyê wan yên tibî, xwarinê û hemû taybetmendiyên din tarîf dike. Hemûyan tasnîf dike û şert û mercên lê şîn dibin û digihin tarîf dike. Berhema Dîneweri ji berhemên Dioscorides û Teofrastos yên yewnan ku wan jî li ser netaban nivîsaniye berfinehtir e.

Fîlozofê navdar yê Rojhilata Kurdistanê Îbn Quteybe (z. 828 - m. 885) li ser hedîsên Mihemed, tefsîra Qur'anê, dîrok û fîlolojiyê gellekî berhemên giring nivîsiye.

Şihabedînê Suhrewerdî (z. 1155 - m. 1191) damezrênerê Îşraqîtîyê ye, felsefeya Rojhilata navîn ya Îslamê de fîlozofê herî bandordar e. Bi fikr û ramanên xwe rê li pêş piraniya fîlozofên misilman û gelek fîlozofên Ewropayî vekiriye.

Felsefevanê navdar Amîdî (z. 1156 - m. 1233) li ser felsefê, mentiq û fiqihê nêzikî sî berhem nivîsiye, Amîdî bi xwe ji bajarê Amedê ye ji ber wê yekê Amîdî têye nas kirin. Dîsa ji Amedê Îbn el-Ezraq (z. 1116 - m. 1176) ku ji Farqînê bû pirtûkek bi navê Tarîxî Meyafarkin (Dîroka Meyafarqîn) bi zimanê erebî dinivîse û tê de behsa Dîroka Farqînê û dîroka dewletên kurdan dike.



Saeta fîlê a El-Cizîrî

Di sedsala 13'an de Fexredînê Exlatî li bajarê Bedlîsê ji bo astronomiyê resetxanekî ava dike. Exlatî xebatên xwe bi zanyarê fars bi Nesîredînê Tûsî ve dike.

Fizîkvanê kurd Îsmaîlê Cizîrî bingeha zanistiya Robot û Sîbernetîkê, di Sedsala 12'an de avêt. El-Cizîrî pirtûkek bi navê Kîtab ul-Hîyel (Pirtûka Huneran) nivîsiye û tê de digel nîgaran, behsa çêkirina 50 amûrên mekanîkê jî kiriye. Herçiqas pirtûka wî ya orjînal xwe negihandibe dema me ya niha jî, lê kopyaya 15 ji wan xwe gehandine roja me, deh ji wan berhemên wî, di mûzeyên Ewropayê de, 5 jî di mûzeyên Tirkiye de li Stenbolê di mûzeya Suleymaniye û Topkapıyê de ne. Pirtûka El-Cizîrî ji şeş beşan pêk tê. Di beşa pêşîn de deh tarîfên cuda yên di derbarê çêkirina saetên avê de hene. Di beşa duyem de derbarê çêkirina hin firaqan deh tarîfên cuda hene. Di beşa sêyem de ji bo çêkirina misîn û amûrên destnimêjê û tasan, deh tarîfên cuda hene. Di beşa çarem de di derbarê çêkirina hewz, fiskiye û çêkirina otomatên muzîkê de deh tarîf hene. Di beşa pêncem de pênc tarîfên di derbarê amûrên ku ava çalên ne gelek kûr û agahiyên ava zêdekirina çemekî de hene. Di beşa şeşem de pênc tarîfên derbarê şiklên ku naşibin hev û agahiyên çêkirin hene. Bi kurtasî di pirtûka wî de agahiyên di derbarê saeta avê, aman û avhilavêjên xwekar û otomatîk, amûrên avdana ji robar û cokan, amûrên lêdan û jenîna xwekar û otomatîk a bilûrê de hene.

Wêneyek ji pirtûka El-cizîrî, Diyagrama makîneyên bi hêza hilkişîna avê, (Ev li Stenbolê ye)

### Çêkirina El-Cizîrî ya ji bo rakirina avê

Ji malbata Îbnul Esîr ku bi xwe ji Cizîrê bûn, (Mecdedîn, Elî û Diyadîn) sê bira hersê jî nivîskarên serdema navîn yên Îslamê bûn. Ji van birayan yên navdar Elî ibn el-Esîr e ku bi berhema xwe ya bi navê "El Kamîl fî tarîx" tê nas kirin. Elî evî pirtûka xwe di navbera salên 1230-1231'an li bajarê Mûsilê nivîsiye.

Îbn Xelikan (z. 1211 - m. 1282) nivîskarê bîyografîyê ye li pey xwe pirtûka xwe ya bi navê Mirina Zadegan ku tê de qala jiyana 865 kesan dike hîştiye.

Şemsedînê Şehrezûrî li ser felsefe û tibê, xebitiye û felsefeya Şihabedînê Suhrewerdî ya îşraqîtîyê berdewam kiriye, li pey xwe pênc berhem hîştiye.

Ebûlfida fermandarê Dewleta Eyûbiyan bû li ser xweza, dîrok û astronomiyê xebat kiriye. Kratera Ebûlfida ya li ser heyvê bi navê Ebûlfida ve hatiye binavkirin. Du berhemên wî yên giring hene, yek Muxtasarû Tarixîl Beşer a dîrokê ye û ya din jî Teqwîmûl Buldan e ku ji 28 beşan pêk tê û li ser erdnîgarîyê ye.

Nivîskar û dîrokzanê Fransî Cara de Vaux (z. 1867 - m. 1953), Ji bo Ebûlfida dibêje "Ew bi fermandariya xwe û bi biriqandina pênûsa xwe, hêza şûran di binê sîya pênusê de hişt."

Hunermendê kurd Mehmûdê Kurdî, di Sedsala 15'an de jîyaye û gelek berhemên girîng ên cuda afirandiye, ew berhemên wî niha li gelek welatan bi piranî li Ewropayê têne dîtin. Hemî berhemên wî bi kurdî têye nas kirin.

Di sedsala 17'an de jî Ehmedê Xanî li ser erdnîgarî û astronomîyê pirtûkekî bi zimanê kurdî bi navê Erdê Xweda dinivîse û tê de behsa Gerstêrkan dike. Lê mixabin ku ev berhema Xanî negihiştiye destê me.

Ebdurehman Kurdî ( m. 1655) li ser matematîk û zanistên din pirtûk nivîsiye. Di derbarê jiyana Ebdurehman Kurdî de zêde agahî tuneye.

Îbrahîm Heqî Erziromî (z. 1703 - m. 1780) di Medreseyên Kurdî xwendiye zanyarekî girîng e. Erziromî li ser astronomî, sosyolojî û fizîkê xebitiye. pirtûka wî ya navdar Merîfetname ye. Erziromî tê de qala pergala rojê kiriye.

Ji pirtûka Merîfetnamê ya Erziromî (Nexşeya dinyayê)

Di sedsala 19'an de Melayê Erwasê pirtûkek bi zimanê kurdî li ser tibê nivîsandiye, Erwasî di pirtûka xwe de qala nexweşiyan dike û dermanê her nexweşiyê û çêkirina dermanan jî dibêje.

Evdirehmanê Axtepî li ser fiqih, mentiq, tib, felsefe û astronomiyê xebat kiriye. Pirtûka Axtepî ya li ser astronomiyê hatiye nivîsandin Axtepî tê de tevgera stêrk, hîv, roj û ya exteran şirove dike, herwiha Evdirehmanê Axtepî gutlek di rengê dinyayê de ji dara gûzê çêkiriye û li serê parzemînan jî daye nîşandan. Pirtûkekî Axtepî jî li ser tibê, yek jî li ser felsefê ye û du cîld e.



## Mêtîngerî

**Sîpan Şînda**

Kambaxiyek a herî mezin ku di dîrokê de hatî serê mirovahiyê jê mêtîngerî ye. Mêtîngerî, ango kolonyalîzm, ji roja derketî û hetanî îro, bûye bela serê mirovahiyê. Ne tenê bela serê mirovahiyê, herwiha sewalan û xwezayê jî.

Çi welatê ku hatî mêtînger kirin li wî welatî şîn û girîn, talan kirin û wêran kirin, kambaxî, xizanî, nexweşî, sergum, êşkence, girtin, kuştin… qet jê xilas nebûye. Niştecihên wî welatî her û her di bin pêstûrî û zilmê de ne. Berovajî vê, mêtînger ji her keyf û xweşiyê li ser pişta wan xizanan dikine.

Dema mirov li rewşa welatên mêtînger û yên ku hatîne mêtînger kirin dinêre, ev rewşa henê bi awayekî zelal derdikeve li ber çavan. Ka berê xwe bidine dewletên Ewropî yên mêtînger û Japonya, rewşa her yekê ji yê din xweştir e. Lê ka li welatên mîna Kurdistanê, Îndonezya, gelek welatên Efrîka yên ku hatîne mêtînger kirin binêrin; rewşa her yekê ji yê din xirabtir e.

Muzeyên Ewropa bi hezaran alavên giranbiha yên ku ji welatên xizan hatîne dizîn yan jî bi darê zorê ji wan hatîne standin tijî ne. Kolonyalîstan him kuştin kirine, him dizî û destdirêjî kirine, him bi sed hezaran kes kirine kole û kirîn û firotina wan kirine, him jî mal û xezîneyên wan revandine û anîne li welatê xwe di muzeyên xwe de rayêxistine û hê jî bi wan diravan qezenc dikine û xwe bi wan alavan ku kalikên wan dizîne nav didine. Lê ew nizanine ku ew alav hemû delîlê diziya wan in. Kolonyalîstan ne tenê ev kirine, herwiha her tim hewldane ku exlaqê civakê jî têk bibine. Ji ber ku wan dagirkirina welêt bes nedîtiye û xwestine hişmendî û binhişîya gel jî dagir bikine.

Ka em fekine rewşa Kurdistana ku eve pênsed sal e hatî dagir kirin. Gelo çi maye ku mêtîngerên ku Kurdistan dagir kirine, ne anîne li ser Kurdan û welatê wan? Kumkujî be kirine, talan kirin be kirine, xenaqandin be kirine, destdirêjî be him li mêran, him li jinan, him li zarokan him jî li sewalan kirine; şewatindin be kirine, gund û bajar xirakirin be kirine, dizî be bi milyonan caran kirine; bi zêr û petrola vî welatî dewlemend bûne û keyfê dikine, dikine û dikine… Gelo ewan heta niha di Rojhilata navîn de çend netew qelandine? Kurdistan dergûşa mirovahiyê bû, lê îro ji xeynî Kurdan kesek nehêlane. Ermenî qir kirin, Asûrî qir kirin, Sûryanî qir kirin, Keldanî qir kirin, Aramî qir kirin, qir kirin û qir kirin. Lê dîsa jî têr nebûne. Kurd mane û li ber xwe didine, lê hindik maye ku wan jî qir bikine. Ango Kurd jî di bin pencên mêtîngeriyê de berû qelandinê diçine. Ji xwe asîmîlasyona li ser Kurdan gihaye armanca xwe û qir kirina fîzîkî ji eve pênsed sal in didome. Ji beriya komarê anatoliya tijî Çerkez bûn, lê belê tu niha yekê tinê jî nikarî peyda bikî. Ji ber ku yê hatîn kuştin jixwe mirin yên din jî yan revîn yan jî hatin bişaftin.

Belê mêtînger îro jî nasekinine û ji bona civakê pitir têk bibine tişta ji destê wan tê dikine. Divê îca Kurd jî li himberî vê rewsê tevdîrên xwe bigirin e.

# Şaredariya Gel xizmetkara civakê ye

Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Amûdê Ferhan Derwîş diyar kir ku ji sala 2013`an ve û heta niha Şaredariya gel a bajêr ji bo xizmeta civakê û rêxistinkirina bajêr gelek kar û xebatan dide meşandin. Herwiha di sala bûrî de wan 6 pirojeyên xwe qedandin.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**



Şaredariya Gel a bajarê Amûdê di havîna sala 2013`an de hat damezrandin. Di wê demê de Rêveberiya Xweser nehatibû damezarandin, lê li ser asta giştî Rojavayê Kurdistanê, hemahengiyeke di navbera Şaredarî û Komînan de dihat birêvebirin. Kar û barên rêxistinkirina Şaredariyan dihat pêkanîn. Bi rengekî xweser Şaredariyan kar û xebatên gel bi rêve dibirin û xwe dan pêş. Şaredariya gel armanca wê, xizmeta civakê û çareserkirina pirsgirêkên gel e.

**Beşên Şaredariyê:**

Di nava Şaredariyê Gel de gelek beş cih digirin, Kombend ew jî belav çend beşan dibe, Kombenda Fenî, Tenduristî, ekolojîke. Kombenda fenî li ser muxalefeyên di nava bajar de disekine. Kombenda ekolojîk paqijiya bajar girêdayî wê ye, Kombenda Tenduristiyê bi tenduristiya bazarê ve mijol dibe û rojane gerên wan di nava bajar de pêk tên. Kombenda hiqoqî çi pirsgirêkê derkevin û giliyê hebin ew pê radibin. Ofîsa Fenî, Rawestgeha Şaredariyê, beşek taybet a xizmetên paqijkirinê, Beşê Avê, Dîwana Şaredariyê, Beşê Têkiliyan ew jî pêşwaziya giliyan dike û daxwazên heyî ji aliyên Têkildar re rêdike. Beşê Hiqoqî, Komîta Ceneratoran ew jî li ser ceneratoran disekine, ji bo dema pirsgirêkên ceneratoran çareser bike. Ofîsa ekolojîk jî li ser paqijkirina bajar disekin e, herwiha karkerên taybet bi vî beşî hene û Ofîsa Bexçeyan, Ofîsa jinê û Ofîsa Ragihandinê.

Derbarê kar û xebatên Şaredariya Gel a bajarê Amûdê hevserokê Şaredariya Gel a Amûdê Ferhan Derwîş ji rojnameya me re axivî.

Ferhan Derwîş diyar kir ku kar û xebatên wan li ser asta bajar tê birêvebirin û wiha got: "Kar û xebatên Şaredariya Gel a bajarê Amûdê, li ser asta bajar tê birêvebirin, bêtirî xwe karê fenî tê kirin, mîna rêxistinkirin û xweşikbûna bajar, di heman demê de ji bo tenduristiya bajar, gerên me li ser tevhî bazarê heye. Herwiha ji bo madeyên dîroka wan qediyayî ku bi tenduristiya giştî bajar ve girêdayî, şopandina me ji bo vê yekê jî heye. Di aliyê paqijî, vekirina kenalê avqirêjiyê û çêkirina riyan de, xebatên me bi rengekî baş bi rêve diçe. Kombenda Şaredariyê rojane li ser karê xwe ye, bi riya wan jî kar û xebatê rêxistinkirin û paqijkirina bajar tê meşandin. Beşê têkilî û lêkolînan yên girêdayî şaredariyê jî gerên xwe di nava bajar bi hemahengiya komînan pêk tînin, da ku pêrsgirêkê gel guhdar bikin û bighînin şaredariyê û em wek şaredarî li gorî wan pirsgirêkan tevbigerin."

**Şaredariya Amûdê di sala bûrî 6 piroje pêk anîn**

Derwîş di dewamiya axaftina xwe da eşkerekirin ku di sala bûrî de 6 pirojeyên wan temam bûn û wiha got: "Di nava sala bûrî de Şaredariya Gel a bajarê Amûdê 6 pirojeyên xwe bi rengekî xweşik bi dawî kir. ew jî ev in: Berdewambûna Bexçeyê Serok, Serarskirina ziftê, rastkirina zivtê, bilinkirina kenalên ava baranê, Kevrê hûrkirî û danîna cenetorekî li ser bîrekê. Herwiha pirojeyên me yên sala 2024`an jî di nava pêşinyarê de ne. Ji xwe di sala 2023`an de pirojeya Sînaa Amûdê di nava pilansaziyê de hebû, me hewl dida ku bi dawî bikin, hin pirsgirêk di wir de derketin, lê di sala 2024`an de ew piroje hatiye erêkirin, ji bo wê em di nava hewldanê de ne ku vê pirojeyê birêve bibin, ji ber pirojeyeke pir girîng e."

**'Armanca me xweşikbûn û rêxistinkirina bajar e'**

Derwîş anî ziman ku 4 gund girêdayî Şardariya Amûdê ne û wiha got: "Navend û gundên girêdayî Şaredariya Gel a bajarê Amûdê jî evin; navenda avê ku yekser girêdayî Şaredariyê ye, di heman demê de Tugeya Agirkujê cihê xwe di hundirê şaredariyê de digire. 4 gund jî girêdayî Şaredariya me ne (Gundê Qaso, Hisên Romî, Heremcimo û Tilhebeşê ye. karê û xebatên ku di bajar de dibe li gorî hêza şaredariyê di wan gundan de jî tê meşandin ev kar û xebat jî di aliyê paqijî, kanalê avqirêjiyê, çêkirina Riyan de ye. Pirsgirêkên ku em rastî wê tên ew e ku gund di aliyê rêxistinî de ne di hundirê pilanameya şaredariyê de ne. Armanca me ya sereke jî xweşikbûn û rêxistinkirina bajar e"

**'Parastina xweşikbûna welat erka me ye'**

Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Amûdê Ferhan Derwîş axaftina xwe wiha qedand: "Dewleta Tirk a dagirker bi van êrişên xwe yên hovane yên li ser Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybet hedefgirtina binesaziya herêma me, dixwaze gel me koçber bibin û welatê me ber bi qirkirinê ve bibe, di heman demê de dixwaze erdnîgariya herêmê bughere, ji bo wê em jî weke Şaredariya gel bi biryar bin ku em kar û xebatên xwe ranawestînin û her wê îrade û hêza me hebe. Parastina xweşikbûna welat erka me ye."



## Dewleta Tirk û mela

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Li Bajarê Amedê li navçeya Pasurê roja înê, di xwendina xutbêde buyerekî qewimî.
Qeymeqamê Pasurê diçe nimêja înê, dibîne kû melayê Mizgeftê xutbeya kû dîyaneta Tirkan jêre amade kiriye û şandiye dixwîne. Lê belê behsa leşkerên hatine kuştin nake. Xwedê giravî leşkerên li başurê Kurdîstanê hatine kuştin, ji bo wan duayan nake û nabêje „Şehîd" bûne.
Qeymeqam mela dikşîne odeyê û bi hesinê miqrofonê li melê dide. Mela dike qîr û dibêje; bavê min cerdevane, birayê min polîse, tu çima li min didî.
Qeymeqam têra xwe li mela dide û ji Mizgeftê derdikeve.
Piştre buyer eşkere dibe û raya giştî pê dihese.
Serokê Partiya Nîjadperest Dewlet Bexçelî, li beramber raya giştî axivî û got: „Ez çavê qeymeqam maçî dikim, destê wî saxbin".
Mudûrîyeta Polêsan jî diyarî dan ví Qeymeqamî.
Kurdên kû dibêjin em Kurdin, xwedan îman û Îslamin deng jiwan derneket.
Tirkên ku xwe misilmanên cîhanê bi nav dikin, gotin va mela melayek xayine.
Carekî din Kurdekî bavê wî cehş û birayê wî polîs, kesên welatparêz lê xwedî derketin.
Divê ji vê meselê dersên girîng werin derxistin. Mela Memurê dewleta Tirke. Liba dewletê cîh digre û hemû tiştên dewletê diparêze. Rexmî vê yekê cardin nikare ji xezeba dewleta Tirk xwe biparêze. Ev mela û malbata xwe, malbatek alîgirê neyarê Kurd, di hemû karên dewletêde cîh digrin.
Bav cerdevane, nêçîra zarokên Kurdan dike û dixwaze Kurdên xwedan şeref û xwenas bikuje.
Polêsê bira, ji bo Kurd bi zimanê xwe neaxivin, xwedî lixwe û welatê xwe dernekevin, behsa şerefa xweya millî nekin, zarokên Kurdan yên welatparêz, oldarên kû Îslama rast dihebînin, ser navê hêza dewleta Tirk, bişev davêje ser malên wan, wan binçav dike, qetl dike, îşkence dike û dikin zîndanan.
Mirov çawa dikeve vê rewşê û çawa vê revşê dipejirîne?
Vê dewleta hov, Kurd kirine sosret, henekî Kurd bune bendeyên wan, liba wan cîh digrin. Senteza Îslama Tirk wek jehriyek li ser Kurdan dibarînin.
Ev cerdevanên olfroş, ku bi navê mela û îmametiyê kar dikin, di Kurdîstanêde pêşengiya Senteza Îslama Tirk dikin.
Ey kurdo: ka li dereûdora xwe mêzeke, tu ji bo meaşekî, kursîyekî, pişt mizdanekî, dikevî çi rewşê.
Tu heta li cem vê dewleta hov cîh bigrî, çi karî dikî bike, tu xwe ji bo wan perçe perçe jî bikî, dawîya te lêdan, kuştin û rezalete.

Îslam bi zanyariya medreseyên Kurdîstanê li welatê me pêşketibû û ev Îslamekî rast bú. Civakê jî, ji vê olê sud wer digirt. Pirsgirêkên xwe bi melayê xwe û rusipiyên xwe çareser dikir.
Divê tu carî neyê ji bîr kirin, ola dewletan ji bo berjewendiyê dewletane, dînê dewletan, ne dîne Xwedê, ne jî dînê Pêxemberane. Dînê dewletan navê vî çidibe bila bibe, dînê Nemrut, Fîrewn û dînê Ebu Cehîlane.
Bê vîjdane, bê merhemete, hove, qatile, diziye, xapandin û derewe.
Dînê maddê û ê berjewendiyêye.
Dema hûn neligor berjewendiyên wan tevbigerin, karin we bikujin û bi sedan seydayên me qetil kirin.
Kurdo: Ev dewlet neyarê teye, ji bo te tune bike, di xebite. Kurdê herî baş, li gor vê dewletê, Kurdê miriye!
Wek Qur'an dibêje: Îzzet û şeref ne li ba desthelatdaran û berjewendî perestane. Îzzet û şeref li ba Xwedê û li ba heqîqetêye.

# Li Kurdistanê şerê taybet bi her awayî li ser gelê kurd pêk tê

**Rustem Jiyan**

Hêjaye ku em rêzenvîsa xwe ya vê hefteyê li ser babetên şerê taybet ê ku li Kurdisatnê pêktê vebêjin û bi awayekî zanistî li ser meselê de biçin. Bêguman Rêber APO di dirêjahiya salan de dabû zanîn ku em dikarin li dijî vî şerî bi rola parestinê rabin. Dikare bê gotin ku Kurd ên yek ji gelên herî kevnar ê Mezopotamya yê ku ji bo belavbûn, pêşketin û zayîna mirovahî û civakbûnê buye xwedî cihekî girîng û erdnigariya wê Kurdistan; bi sedan salan ji aliyê hêzên serdest ve bi polîtîkayên talan, dagirkerî, tacîz, destdirêjî, qirkirin, asîmîlasyonê re rû bi rû maye. Ji bo gelê Kurdistanê yê nûnertiya hêzên şaristaniya demokratîk dikin ji dîrokê were jêbirin her cûre sêpan ketiye meriyetê. Bi zayîna şaristaniya dewletperest re erdnîgariya Kurdistanê bi van polîtîkayan re rû bi rû maye. Ji qirkirinên fîzîkî, siyasî, aborî û civakî hatiye derbaskirin. Pergala serwer, bi polîtîkayên xwe yên şerê taybet ên ku taybet bi sedsala 20'emîn ve gihiştiye lûtkeyê siyaseta înkar û tunekirinê bi ser vê bingehê daye meşandin. Yê ku hatiye armanckirin, bêwatekirina nirxên civaka Kurd e. Ji bo bi navê Kurdbûnê tu tiştek neyê hiştin tu rêyek nehatiye ceribandin nehatiye hiştin. Gelê Kurd ê xwedî çandekî bihêz a civakî û dîrokî ye, bi navê wê ji nirxên xwe yên cewherî û çanda xwe dûrxistinê bi her cûre sepanên derveyî mirovahiyê re rû bi rû maye. Navendên şerê taybet, hemû sepanên xwe di şexsê gelê Kurd de xistiye meriyetê. Bi sepanên weke asîmîlasyon, bê nasnamekirin, koçberkirin, guhartina demografîk, bêçandkirin, yozkirin, sîxurkirin, entegrasyon, 3 S (sex, spor, sanat) hatiye xwestin ku gelê Kurd dît were girtin. Dema ku li hemberî van operasyonên dîlgirtinê bersiva gelê Kurd bû berxwedanî, ev sepan her roj bi kûrbûnê û zêdekirina tundiyê heya roja me ya îro berdewam dikin.

Yek ji ferasetên beş bike-parçe bikerê ve bibe ya hêzên emperyal jî bi Kurdistanê diyar kirine, bi hevpeymana Lozanê re şênber bûye û bi vê awayê Kurdistan kirine çar parçe. Li her yek parçeyek jî bi destê dewletên serwer (Îran, Tirkiyê, Surî, Iraq), di bingehê înkara hebûna gelê Kurd de sepanên pratî ketiye meriyetê. Her çiqas weke konseptek giştî li Kurdistanê amûrên şerê taybet hatibe diyarkirin jî, hêzên tetîkger û pêkhênerên li qada pratîkê ev dewlet bûne. Di pêvajoyên belvabûna pergala kapîtalîzmê de bi awayekê sinsî amûr xistine meriyetê, hatiye xwestin ku gelê Kurd bi awayê ku carekê din zindî nebe were bin axkirin. Armanc tûnekirin û tune hesibandin e. Dewletên ku li ser vê armnacê dimeşin, ji dîrokê heya roja me ya îro serî li gelek rêbazan dane. Ev çanda kevneşopiya ku ji Osmaniyan hatiye destpêkirin heya roja me ya îro bi awayekê birêxistinkirî bi zêdekirina meylên xwe yên şerê taybet ê li ser Kurdistanê berdewam kiriye. Her çiqasî di qada pratîkê de dewletên Îran, Iraq, Surî û Tirkiye xuya bike jî, ji bo Kurdistanê talîmata meylên şerê taybet ji aliyê Îngiltere û DYE yê hêzên hegemon ve hatiye dayîn. Hatiye xwestin ku rastiya Kurd a ji nasnameya xwe ya cewherî û nirxên xwe hatiye dûrkirin, ber bi xiyanetê ve hatiye kişandin û xwe înkar dike were avakirin.

Di vê şerê ku tê meşandin de beşên civakî yên hatine hedefkirin, bûye jin û ciwanên ku di rîsta pêşengê civakê de ne. Ev her dû beşên civakî yên Rêbertî di înşaya netewa demokratîk de rîsta pêşengtiyê daye wan, bûne beşên ku herî zêde ji êrişên şerê taybet para xwe girtine. Ji hêla pergala zilam û desthilatdar ve jin û ciwanên ku ji nirxên xwe hatine dûrxistin, heman demê de tê wateya civaka ku dîl hatiye girtin. Ji xwe ceribandinên yekemîn ê her dîtinê, di şexsê jinê de ketiye meriyetê û bi vê awayê li ser hemû civakê hatiye pêkanîn. Rastiya civaka ku bûye pîrek jî bi vê rêyê xwestine ava bikin. Jina ku hatiye xistin û civaka ku hatiye pîrekkirin, tê wateya kesayeta ku ji pergalê re hatiye amadekirin. Ji ber vê yekê, van polîtîkayên di şexsê jinê de tên pêkanîn fêmkirin, wê bihêle ku em polîtîkayên şerê taybet ê li ser Kurdistanê têne meşandin hîn baştir fêm bikin. Pergala zilam bi van sepanan ve xwestiye civakbûn, berxwedêrî, têkoşînvanî, parastina nirxên civakî, avahiya exlaqî ya jina Kurd parçe bike. Jina Kurd, bi polîtîkayên şerê taybet di warê çandî, aborî, derûnî, civakî û siyasî bi bombebaranê re rû bi rû maye. Xuyaye ku heya jina Kurd ji vê cenderê neyê rizgarkirin, emê nikaribin polîtîkayên şerê taybet ê li ser civakê tê meşandin jî vala derbixin. Bêguman ev rewş ji her demî zêdetir xwe di her qada civakê de bandoroiyekî gelek mezin dike û di heman demê de têkiliyên civakê jî parçe dike. Yanî dikare bê gotin ku Şerê taybet, şerê ku pergala netew-dewlet bi xwe pêşxistiye ye. Di roja me de di hemû qadên civakî de tê meşandin: Qada aborî, qada perwerdehî, qada civakî, qada çandî, qada siyasî, qada propaganda û jin. Ji xwe pergal ji her demê zêdetir van hedef digre û dixwaze her tiştî ji rê derxe. Ji lewra tedbîrgirtina me jî pêwîst e li ser bingha paradîgmaya neteweya demokratîk ya ku Rêber Apo bi destê xwe avakiriye bê.



# Piştî Operasyona Mirovî û Ewlehiyê dê kampa Holê ewletir bibe

**Navenda Nûçeyan**



Hêzên Ewlekariya Hundirîn pêvajoya sêyemîn a 'Operasyona Mirovî û Ewlehiyê' li kampa Holê ragihandin û destpêkirin û wê operasyon berdewam bike. Kampa Holê ya li kantona Cizîrê, li herêmê bi giştî xetereyek mezin çêdike, ji ber ku malbatên çeteyên DAIŞ`ê lê ne û çete hewl didin wê bikin jêdera şaneyên DAIŞ`ê û çeteyan û lê perwerde bikin, her wiha ji şaneyên xwe yên li Iraq, Sûriye û cîhanê propagandeyê bikin.

Di kampê de derdora 54 hezar kes hene; 27 hezar Iraqî û 18 hezar Sûriyeyî û derdora 8 hezar malbatên çeteyên DAIŞ`ê hene. 2021`an, beriya destpêkirina 'Operasyona Mirovî û Ewlehiyê' di nava kampê de şaneyên çeteyên DAIŞ`ê 47 kes darve kirin ku li dijî perspektîfên wan derdiketin. Di encama kuştin û hewldana kontrolkirina kampê de, Hêzên Ewlekariya Hundirîn bi piştgiriya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) pêvajoya yekemîn a 'Operasyona Mirovî û Ewlehiyê' di 28`ê Adara 2021`an de da destpêkirin. Operasyonê 5 rojan dewam kir û 2`yê Nîsanê bi dawî bû. Zêdetirî 5 hezar şervanên hêzên beşdar, tevlî operasyonê bûn.

Di pêvajoya yekemîn de 125 şaneyên çeteyên DAIŞ`ê hatin girtin, ji wan 20 çete berpirsên bûyerên kuştinê bûn. Her wiha di operasyonên lêgerînê de gelek pêdiviyên leşkerî û madeyên teqemeniyê hatin desteserkirin. Dema ku operasyon û xebatên lêgerînê yên di nava kampê de bi rêve diçûn, dewleta Tirk a dagirker êrişî herêmê kir. Ji ber wê, Hêzên Ewlekariya Hundirîn û QSD`ê bi wan êrişan re mijûl bûn, ji lew re hewldanên sepandina ewlehiyê û îstiqrarê li kampê hatin astengkirin.

Dewleta tirk hêzên di tunekirina DAIŞ`ê de cih girtiye yan jî operasyon li dijî şaneyên DAIŞ`ê yên li Baxozê bi rê ve birine, kirin hedef. Yek ji wan jî şehîd Jiyan Tolhildan bû ku pêvajoya yekemîn a operasyonê bi rê ve bir û tevî 2 hevalên xwe yên YPJ`ê û Têkoşîna li dijî Terorê di 22`yê Tîrmeha 2022`yan de di êrişa balafireke bêmirov û biçek a dewleta Tirk a li dijî erebeya wan de, şehîd bûn.

Her wiha di êrişa balafireke bêmirov a dewleta tirk de piştî pêvajoya duyemîn a Operasyona Mirovî û Ewlehiyê de di 28`ê Îlona 2022`yan de, hevseroka Nivîsgeha Edalet û Çaksaziyê Zeyneb Mihemed û Yilmaz Reşo şehîd bûn.

**Pêvajoya duyemîn**

Ji destpêka 2022`yan ve û heta 25`ê Tebaxa 2022`yan, şaneyên DAIŞ`ê û malbatên wan 43 êriş kirin. Di wan de 44 niştecihên kampê bi kêr, tiving, debançeyên bêdeng hatin kuştin. Ji wan 14 jin û 2 jî zarok bûn. Termên wan qurbaniyan diavêtin kanalîzasyonê ji bo ku sûcan veşêrin. Her wiha çeteyên DAIŞ`ê 13 caran hewl da niştecihên kampê birevînin. Kon tevî niştecihên wê bişewitînin, alîkariyên mirovî û tenduristiyê û xizmetguzariyê jî telef bikin. Tevliheviyê çêkin û sûra li dora kampê rakin.

Ji ber wê Hêzên Ewlekariya Hundirîn bi piştgiriya QSD'ê û Koalîsyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ`ê pêvajoya duyemîn a operasyonê di 25`ê Tebaxa 2022`yan de da destpêkirin ku 24 rojan dewam kir.

Hêzên di wê pêvajoyê de, gelek noqte û cihên çeteyên DAIŞ`ê yên ku fikrê tundraw fêr dikirin tune kir, gelek jinên DAIŞ`î yên xetere ku di wê demê de endam di nava kampê de perwerde dikirin, sûc li dijî niştecihên kampê kirine, girtin. Her wiha hêzê li dijî koma "Hisbê û Eşbalên El Xîlafe" operasyon li dar xist, gelek berpirsên wê girtin.

Di lêpirsînên wê demê de hate diyarkirin ku 3 jêderên çekan ên DAIŞ`ê hene, ya yekemîn destê hin karmendên rêxistinan tê de heye, bi taybet 'Rêxistina Bihar' ku çek û pere derbasî kampê dikirin û revandina endam û çeteyên DAIŞ`ê hêsan dikir. Jêdera duyemîn jî çekên ferdî û bombe ne ku hevserên çeteyan û zarokên wan di nav cil û bergên xwe de vedişartin dema ji Baxozê reviyan. Jêdera sêyemîn jî, DAIŞ`ê derfetên ji rêxistinan re hatine pêşkêşkirin, bi kar anîn û amûrên tûj wekî xencer, kêr, bato û amûrên îşkencekirinê çêkirin û pê niştecihên kampê tirsandin û ew neçarî teslîmiyetê kirin.

Di wê pêvajoyê de, YPJ`ê 2 jinên ciwan ên êzidî ji destê jinên DAIŞ`ê xilas kirin û birin cihekî ewle. YPJ`ê, 4 jinên ku bi zincîran hatibûn girêdan û îşkence li wan hatibû kirin, xilas kirin.

Her wiha di pêvajoya duyemîn de, 226 kes hatin girtin. Di nava de 36 jin hebûn ku tev li bûyerên kuştin û tirsandinê bûbûn. 25 tunel û xendek hatin dîtin û gelek çekên navîn û sivik hatin desteserkirin.

**Fermandarekî têkildarî Operasyona Mirovî û Ewlehiyê agahî dan**

Fermandarê Hêzên Komandos ên QSD`ê Agirî Jiyan têkildarî qonaxa sêyemîn a Operasyona Mirovî û Ewlehiyê ku hîna berdewam e, agahî parve kirin.

Agirî Jiyan got: "Operasyon hîna berdewam e, xebatên lêgerînê di nava beşên kampê de li gorî hatiye plankirin, berdewam in. Di operasyonê de ku ketiye roja 9`an, gelek mayin û çekên di bin kampê de dihatin veşartin, hatin desteserkirin û gelek çeteyên şaneyên DAIŞ`ê hatin girtin."

Agirî Jiyan diyar kir ku di xebatên lêgerînê de gelek pirtûk û lênûsk hatin dîtin ku zarok û niştecihên kampê li ser tên perwerdekirin û ji wir diyar dibe ku çi qas kamp û nifşê tê de mezin dibe xeternak e û jinên DAIŞ`î vê zîhniyetê diparêzin.

Agirî Jiyan aşkera kir ku beşek ji armancên operasyonê bi dest xistine û hîna berdewam e. Her wiha diyar kir ku jinên DAIŞ`î û şaneyên DAIŞ`ê di hin beşan de hewl dan bi kevir, slogan, nedana belgeyên rast û redkirina lêgerînê, xebatên hêzên leşkerî asteng bikin.

Li gorî agahiyên ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn li ser hesabên xwe yên fermî parve dike, di beşa "muhacîran" û ya 5`an de 34 kes hatine girtin, gelek çekên sivîk û cebilxane û 4 mayin hatine desteserkirin û gelek stargeh hatine dîtin.

Her wiha Agirî Jiyan aşkera kir ku xebatên lêgerînê di kampê de didomin.

**Rûspiyên Holê piştgiriyê didin 'Operasyona Mirovî û Ewlehiyê'**

Rûspiyên Holê piştgiriya xwe ji 'Operasyona Mırovî û Ewlehiyê' re ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn bi piştgiriya QSD'ê û YPJ'ê li Holê daye destpêkirin, nîşan da.

Rûspiyên Holê ya Kantona Cizîrê ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê der barê destpêkirina qonaxa sêyemîn a 'Operasyona Mirovî û Ewlehiyê' ji hêla Hêzên Ewlekariya Hundirîn bi piştgiriya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) de di 27'ê Çileyê piştgiriya xwe nîşan da.

Şêxê eşîra Xewatine Mihemed Ebod El Sultan axivî û wiha got: "Em rûspî û şêxên eşîrên navçeya Holê bi giştî û şêxên eşîra Xewatine bi taybet piştgirî û desteka xwe ji 'Operasyona Mirovî û Ewlehiyê' re ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn li Kampa Holê daye destpêkirin, nîşan didin. Ji ber ku ew hewl didin ewlehî û îstîqrarê li herêmê pêk bînin, bi taybet li kampê ku êdî mayîna li ber teqînê ye."

Li aliyekî din jî rûspiya eşîra Xewatine Hemîd El Receb axivî û wiha got: "Em rûspiyên eşîra Xewatine û eşîrên li herêmê heyî nûçe û agahiyên dawîn ên ji Kampa Holê tên dişopînin. Ji lew re em piştgiriyê didin operasyona Hêzên Ewlekariya Hundirîn, da ku kamp were paqijkirin, çavkaniyên terorê werin ziwakirin. Ji ber ku ev kamp ji kampên herî xeternak li herêmê ye ku tê de malbatên DAIŞ'ê yên terorîst hene."

Girêdayî 'Operasyona Mirovî û Ewlehiyê' li Kampa Holê û êrişên dagirkeriya tirk li ser navenda ewlekariya hindirîn li bajarê Qamişlo Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi daxuyaniyekê aşkera kir ku hemwextî 'Operasyona Mirovî û Ewlehiyê' li Kampa Holê, artêşa Tirk a dagirker bi balafireke bêmirov nuqteyeke Hêzên Ewlekariya Hundirîn li Qamişlo bombebaran kir.

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi daxuyaniyekê êrişa dewleta Tirk a dagirker li dijî nuqteyeke Hêzên Ewlekariya Hundirîn ê hemwextî 'Operasyona Mirovî û Ewlehiyê' şermezar kir.

Berfirehiya daxuyaniyê wiha ye: "Hemwextî 'Operasyona Mirovî û Ewlehiyê' ya ji bo kontrolkirina Kampa Holê û sînordarkirina çalakiya şaneyan û ligel xebatên li dijî terorê yên ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn - Asayîşê beşdarî wê dibin, dewleta Tirk a dagirker êrişeke dijwar li ser yek ji xalên Hêzên Ewlekariya Hundirîn – Asayîşê, pêk anî. Di encamê de 4 endam şehîd û hejmarek birîndar bûn. Ev êriş û êrişa beriya wê hate kirin bi tevayî dikevin xizmetî DAIŞêtevgera DAIŞ`ê re ye û di xi û çalakbûna wê. Her wiha armanca wan êrişan astengkirina hewldanên hêzên ewlehiyê di çalakiyên wê de ji bo kontrolkirina ewlehiyê li Kampa Holê ye ku tê de îstixbaratên Tirkiyê bi awayekî zelal bi hemû hêza xwe destekê dide xebatên revandin û tevliheviyê û bi hemû awayan destekdayîna darayî, hêsan dike. Em sersaxiyê ji malbatên şehîdên êrişên dewleta Tirk re dixwazin. Em hêvîdar in ku birîndar di zûtirîn dem de baş bibin. Em bang li raya giştî ya herêmî û navneteweyî dikin ku dawî li kiryarên dewleta Tirk û dijminahiya wê bînin, ji ber ku bi van kiryaran derfetê li pêşiya vegera terorê vedike.

Ev êriş hewldaneke aşkera ya ji bo astengkirina rewşa jiyanî û pêşîgirtina li serkeftina derfetên kontrolkirin û piştgirîkirina aramiyê piştî kêmkirina tevgera DAIŞ`ê û aliyên mîna wê ye, ku dixwazin tevlihevî û şerê navxweyî geş bikin. Em teqez dikin ku Koalisyona Navneteweyî jî mîna Rûsya para wan ji berpirsiyariya van êrişan heye. Ji ber ku ev êriş di çarçoveya têkbirina hewldanên wan her du aliyan ên ji bo kontrolkirin û piştgirîkirina aramiyê û destekdayîna wê de ye. Em piştrast dikin ku hêzên me yên ewlehiyê di xebatên xwe de ji bo sînordarkirina vegera tundrawê û têkbirina aramî û ewlehiya herêmên me û jiyana gelê me de, berdewam in. "

# Civînên Asîtanayê wê tu carî nebin cihê çareseriyê!

Kirîza Sûriyê her ku diçe kurtir dibe. Hêzên navneteweyî û herêmê qaşo ji bo dîtina çareseriyê bi 10'ê caran li Asîtana, Cinêv û Sûtşî civînên berfireh li dar dixin, lê ji ber ku ev hêz ji bo berjewendiyên xwe kar dikin û nûnertiya gelên Sûriyê nakin, tu çareserî peyda nabe, tersî wê hin hêzên wekî dagirkeriya Tirk bi kiryarên xwe dixwazin kirîzê gurtir bikin. Ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê tenê riyeke heye ew jî projeya Rêveberiya Xweser e.

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

Piştî rawistandin civîna Asîtan ya 20'an ku di sala 2023'an de hat lidarxistin, di 19'ê Çileya 2024'an de berdevkê Wezareta Derve ya Kazaxistanê Êbik Simadyarof li ser destpêkirina civîna Asîtana ya 21'ê erê kir. Herwiha di 24'ê Çile de civîna Asîtana weke hertim ji aliyê hêzên navdewletî yên weke Rûsiya, dewleta Tirk a dagirker, Îran, şandeyên hikumeta Şamê û Opozisyona Sûrî ya bi ser dagirkeriya Tirk ve li Kazaxistanê hat destpêkirin.

Di heman rojê de dewleta Tirk a faşist, serokê Îranê Ibrahîm Reîsî pêşwazî kir û bi Receb Teyîb Ardoxan re civiya, ev pêşwazî jî piştî du caran ji taloqkirinê pêk hat.

Civînên Asîtana yên destpêkê, domdariya wan, rûsniştin û hevpeyvînên Rûsya, Îran û dagirkeriya Tirk bi hev re yên bûrî ku di salên dawîn de çêbûn, rewşa siyasî li Rojhilata Navîn li gor berjewendiyên xwe guherandin. Civînên Asîtan di çileya 2017'an de ji aliyê alîgirên hikumeta Şamê weke Îran û Rûsya ve, li aliyekî din alîgirê Rikberiya Sûriyê weke dagirkeriya Tirk hatin destpêkirin. Van hêzan ji wê demê heta roja îro 20 civîn li dar xistin. Herî dawî jî civîna Asîtana a 21'emîn di 24'ê vê mehê hat lidarxistin. Qaşo armanca wan ew e ku kirîza Sûriyê bi dawî bikin, lê hejmara gelek ji civînên Asîtana yên ku di vê dema kurt de hatin lidarxistin, diyar dibe ku hêzên navdewletî nebûn bersiva gelên Sûriyê.

Bi destpêkirina kirîza Sûriyê re van hêzên navdewletî yên weke dagirkeriya Tirk, Rûsya û Îran ji bo berjewndiyên aborî û dagrkirinê destwerdan di kirîza Sûriyê de kirin, civîn û hevdîtinên weke Cinêv û Sûtşî. Lê ev hêzên ku îro li ser maseya civînên Asîtanayê dicivin, bi domdariya kirîza Sûriyê heta roja îro komkujî di derheqê gelên Sûriyê de pêk anîne. Herwiha erd û binesaziya wê talan kirine û heya niha dibêjin armanca me çareserkirina kirîza Sûriyê ye. Li aliyekî din jî şoreşa 19'ê Tîrmehê jî bi kirîza Sûriyê re destpê kir, vê şoreşê weke qada sêyemîn li ser bingehê Netewa Demokratîk li dijî desthilatdariya li ser jinê û civakê têkoşîna xwe destpê kir. Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji bo gelê kurd û gelên Sûriyê tevî vejînek bû û roja îro riya çareseriya pirsgirêkên gelên Sûriyê ye. Lê ji ber ev yek nakeve xizmeta hêzên navdewletî yên mêtînger weke dagirkeriya Tirk, Rûsya û Îran hertim Rêveberiay Xweser dikin armanc, nexasim di civîna Asîtana ya dawî de, ku tesfiyekirina wê armanca herî sereke bû di civîna 21'ê de.

Yek ji rêgezên dewletên desthilatdar û kapîtalîsta nûjen, lihevkirina li ser berjewendiyên dagirkerî û aborî, di hemandemê de nelihevkirina li ser heman mijarê ye. Ango berjewndiyên ku bikevin xizmeta desthilatdarî û dewletê hebin, li gorî wan gelek baş e, li cem desthilatdaran ne girîng e çi bi serê gelan were û qirkirina gelan tiştekî normal e. Îran û dagirkeriya Tirk jî xwedî heman hişmendiyê ne. Kiryar û siyaseta ku li ser riwê erdê li dijî glelan pêk tînin xwesteka wan diyar dike. Nakokiyên di navbera Îran û dewleta Tirk a faşist de girêdayî sedê salan e, ji serdema impratoriya Osmanî û Sefewî de ye. Aliyek jê ku dewleta Tirk e û li ser rêbaza islama suneyê ye, li aliyê din jî Îran li ser rêbaza islama şî'ayê ye. Îran û dagirkeriya Tirk li Rojhlata Navîn û Asiya bi domahiya dîroka impartoriya Sefewî û Osmanî heta roja îro ola islamê ji bo dagirkeriya herêmê bikar anîne. Di serî de li Sûriyê, Îraq, Libnan, Filestîn û hwd. Yek ji nimûneyên van nakokiayn, pirsgirêka di navbera Îran û Tirkiyê li Ezrbîcanê de ye û hîn çareser nebûye. Dewleta Tirk a dagirker dixwaze Ezrbîcan bixe bin desthilatdariya xwe, Ezerbîcan nêzî dewleta Îranê ye, Îran tu awayan qebûl nake Tirkiye nêzî sînorê wê bibe. Herwiha nêzbûna Tirkiye ji sînorê Îranê re, nêzîkbûna NATO'ê ye û Îran vê yekê naxwaze. Li aliyek din li Bakur û Rojhilatê Sûriyê qalibên nakokiyan yên di navbera Îran û dagirkeriya Tirk di rewşekê de tên şikandin. Şikandina nakokiyên van herdu dewletan jî dema ku doz bikeve




xizmeta gelên bindest, bi taybet gelê kurd, çi li Rojava, Başûr an Rojhilatê Kurdistanê be. Îran ya ku piştevaniya hikumeta Şamê dike, bê deng e li ser dagirkina xaka Sûriyê, weke Efrîn, Serêkaniyê, Girê Sipî. Wekî ku tê xwuyakirin herî dawî dewleta Tirk û Îran li ser dagirkina herêmên weke Heleb û Tilrife'etê jî li hev kirine.

Maseya nîqaş û diyaloga ku di navbera Îran û dagirkeriya Tirk de çêdibe, helbet li ser berjewendiyên siyasî û aborî yên wan tê erêkirin. Herwiha da ku siyaseta wan ya qirêj diyar û eşkere nebe ola islamê ji xwe re weke maskekê bikar tînin. Bi vî awayî ji bo pêk anîna armancê xwe yên cuda bi navê ola islamê mislmanan dixapînin. Ji bo van dewletan ne girîng e ku gel di çi qeyran û komkujiyan re derbas bibi. Şerê ku îroj di navbera Israyîl û Hemasê de didome, sedemên wê berjewendiyên Îran û dagirkeriya Tirk in. Di destpêkê de van herdu dewletan piştgirî dan Hemasê û ew li gor berjewndiyên xwe bikar anîn. Xeta aboriya cîhanî ya ku wê di pêşerojê de ji Hindê were kendava Erebî û derbasî Israyîl bibe û biçe Ewropa nakeve xizmeta aboriya Îran û dagirkeriya Tirk. Di encama şerê ku ji 7'ê Cotmeha sala bûrî ve hatiye destpêkirin heta roja îro derdora 25 hezar filestînî û israyîlî hatine kuştin. Li aliyekî din jî artêşa Israyîl xwedî helwesteke bi tundbû ji ber rêrişa Hemasê ya ku Îran û Tirkiye li pişt wê bû, bi hezaran ji sivîlên filestînî bûn qurban. Şer û pevçûn heta roja îro tê domandin û her ku diçe derbasî qonaxeke cuda dibe. Serdana serokê Îranê Ibrahîm Reîsî ji Erdogan re, wê ji bo rewşa gelê Israyîl û Filestînê re xeteriyeke pir mezin bi xwe re bîne. Di heman demê de wê bandora serdanê li Sûriyê, Rojava, Başûrê Kurdistan û Îraqê jî bike. Êdî xweş diyar e ku hêzên navdewletî weke Îran, Rûsya, dagirkeriay Tirk, Emerîka û hêzên din, Rojhilata Navîn kirine qada şer ji xwe re û her yek li gor xwesteka xwe bibe serdestê herî bihêz.

# Kê Sura Hz.Îsrafîl da dagirkeriya Tirk (?!)

**Volqan Elî**

Di pirtûka piroz de Xweda meleka xwe ya bi navê Îsrafîl bi ragihandina qiyametê wezîfedar dike. Li gorî vê, dê Îsrafîl li Sûrê bide û qiyamet dest pê bike. Xuya dike dagirkeriya Tirk xwe dixe (!) li şûna Îsrafîl. Lê tiştekî ji bîr dike: Bi taybetî di Îslamê de ku yek ji sê olên Îbrahîmî ye, xêr jî şer jî ji Xweda tê. Wekî ku xwendekar bêjin 'ma tiştê ku dagirkeriya Tirk ji bîr kiriye çi tişte?'. Ya yekê di hişmendiya dewleta Tirk de jixwe qet tiştekî xêrê tine. Ya duyemîn jî ew şerê ku di Îslam û hemû reseniya olan de derbas dibe, ne zilm û qetla mirov li ser mirov e. Her mirin û felaketa bi xwezayî ji Xweda were wekî 'şer' were bi navkirin jî mineteke herî mezin e. Yanî 'şerê' ku di pirtûkên pîroz de behsa wê dibe, guherînên Xwedayî û xwezayî ne. Ti eleqaya wê bi şerê dagirkeriya Tirk ve tine. Van rojan, salvegera rizgariya Kobanê ye! Di heman demê de salvegera rojên ku Tayip Erdogan qiyameta Kurdan bide destpêkirin, bi şaşitî xwe li Îsrafîlbûnê(!) rakişandiye. Ji beriya ku Kobanê rizgar bibe li cihekî diaxivî û digot; "… Kobanê jî li ber ketinê ye" û piştî wê jî behsa planên xwe yên li ser Efrînê, dikir. Dîsa ne şaş bim payiza 2018'an bû. Di civîneke NY'ê de diaxifî û behsa plana xwe ya dagirkeriya li ser Rojava dikir. Nexşeyek jî di destê wî de hebû! wisa diaxifî… 'em ê li vê derê korîdoreke ewlehiyê çêkin'. Pir di ser re derbas nebû Serêkaniyê û Girêspî hate dagirkirin.

Me li jor got, ti eleqaya dagirkeriya Tirkan, Tayip û temsîlkarên wî bi 'xêr û şerê' di Îslamê de ye, tine. Ji ber ku ew pirî caran nirxên pîroz bi kar tînin me jî muqayeseyeke wisa. Naxwe, ti armanca me ya cuda tine.

Ev demeke dirêj e, bi taybetî jî hema çend rojan ji beriya ku gerîlayên Kurdistanê (12.01.2024) artêşa Tirk li girê Amediyê bişkînin, endamên MİT'ê di ragihandina Tirk de propagandayek dikirin. Vaye, 'PKK çima qendîl vala kiriye û çûye Silêmanî, artêşa Tirk li dijî PKK'ê çiqas bi serkeftiye'. Mijar cuda bû. Dixwestin ji bo ku li herêmên di bin bandora YNK bidin, li Silêmanî bidin zemînê ava bikin. Armanc ev bû: 'me li Qendîl PKK'ê tengav kir, PKK'ê çû Silêmanî û herêmên din ên YNK'ê. Em neçar in li wir bidin'. Jixwe ev sedem û bahane bû. Ya rast dixwastin YNK jî wekî PDK bikişînin xiyanetê. Lê nedikarîn rasterast gef bixwun yan jî li herêmên di bandora YNK de ye bidin. Pir dem neçû ku fedaiyên gelê Kurd bi Operesyona şoreşgerî ya Helmet Dêralûk pişt li pişt li gurên boz ên Dewlet Bahçelî û Mala Barzanî şikandin, devê Tayip û murîdê wî Hakan Fidan vebû; 'bila YNK jî alîkariya xwe ya bi PKK'ê re dest berde. Naxwe em ê hesabê wê bipirsin.' Bi vî şiklî tiştê ku berê dikirin lê nedikarîn bi ziman bêjin û girantir bikin, êdî dianîn ziman. Jixwe dîsa pir dem di ser re derbas nebû, 25'ê Çileyê erîş birin li ser stastyoneke kerabe û xazê ya li Çemçemala Başur. Di encam de xizmeta gel derb xwar.

Dagirkeriya Tirk ne tenê li Kurdistanê temsîla xirabkirin, bê exlaqî û bê wijdaniyê dike li Tirkiyeyê jî heman karê xirab dike. Li Tirkiye miroveke kêm peyda dibe û temsîla wijdanê dike heye: Şebnem Korur Fincancı. Dinya alem nas dike. Bi îhtimaleke mezin yên ku nas nedikirin jî bi saya dagirkeriya Tirk nas kirin. çima?

Di sala 2022 de dema ku li Zapê çekên kîmyawî hatibûn bikaranîn wê jî bertekek nîşan dabû. Bi kurtasî gotibû 'pêwîst e ev îdîa were lêkolînkirin'. Heta ne ku rasterast jî dewleta dagirker tohmetbar kiribû. Bi rastî jî eger li Tirkiye qanûnên Tirkan bi xwe jî derbasdar bûna ew bi ti ceza û lêpirsînê re rû bi rû nedima. Em niha nirxa bi rûmet a sekna Dr. Şebnem Korur Fincacı kêm nakin, lê rastî û gotina wê ev e. Li ser dewleta Tirk bi xwe jî bi rastî jî eşkere tohmetbariyek tine. Yanî di encamê de dibe ku rast be yan jî rast dernekeve. Dewleta dagirker a çavsor û zikreş xwe li vê jî ranegirt. Di 27.10.2022'an de ew bi vê sedemê girt. Ceza da wê lê ji ber bertekên navneteweyî misoger nekir yanî biryar neda. Niha ev cezayê nêzîkî sê salan misoger kiriye.

Jixwe dagirkeriyê ti xêra wê nabe, lê şerê wî jî ne ti şer e. şerê ku ew fêm dikin û dimeşînin, xirabiya ku ew dikin û dimeşînin tenê dikare ola Zeusê zalim de hebe. Jixwe kurê xwedayê fêlbaz Zeus, navê wî Ares e. Li gorî vê mîtolojiyê hemû gemar û tiştê pîs û xirabî ji Ares digihîje mirovan: Dibe ku ev nav bêhtir li dewleta Tirk û Tayip were.



# Armanca sereke pêkanîna Mîsaqa Milî ye

Dewleta Tirk a dagirker ku xwe li ser xwîna gelên herêmê yên resen daye avakirin, ji bo pêkanîna planên xwe yên dagirkiriyê hewil dide tevahiya gelên herêmê qir bike. Ji Sûriyê bigre heta Iraqê dagirkeriya Tirk komkujiyan pêk tîne û bi hemû hêza xwe hewil dide Mîsaqa Milî pêk bîne.

**Mihemed Xanim/ Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker ji bo pêkanîna planên dagirkeriyê û nûjînkirina osmaniya nû, herwiha pêkanîna Mîsaqa Milî çi ji destê wê tê, dike. Di bingeha xwe de ew li ser xwîna gelên resen yên herêmê hatiye avakirin. Dagirkeriya Tirk ji 2011'an de ji destpêka aloziya Sûriyê ve, bi tevahiya hêza xwe mudaxeliya kirîza Sûriyê kir. Xwepêşandanên gelan veguherand şerê çekdarî û çete ji tevahiya cîhanê derbasî Sûriyê kir. Herwiha lojistîk û çekên giran radestî komên çete yên wekî Cebhet alnusra û hwd.... kir.

### Ji bo qirkirina gelê kurd li her derê bazarn dike

Dewleta Tirk a dagirker li her aliyekî bazaran dike, êrişên qirkirinê pêk tîne û her tiştî dike da ku plana qirkirina gelê kurd û pêkanîna Mîsaqa Milî pêk bîne.Dagirkeriya Tirk di bin hincetên cûda de êrişî xaka Sûriyê dikr, lê armanca wê ya sereke ya strtîjîk hewildana pêkanîna Mîsaqa Milî ye. Dagirkeriya Tirk ji bo cîbicîkirina plana xwe gav bi gav êrişên dagirkeriyê dan meşandin, armanca wê ya sereke jî valakirina herêmê ji gelên wê yên resen û pêkanîna guhertina demografîk di bin hinceta bicîhkirina koçberên Sûriyê. Ji 6 salan ve û heta niha dagirkeriya Tirk bi alîkariya hin rêxistinên ixwanî bi 10'an kampên mitîngeriyê li Efrîn û derdora wê ava kiriye da ku guhertina demografiya herêmê bi lez bide meşandin.

Di navbera daxwazên siyasî û şexsî yên Serokomarê Tirkiyê Erdogan ferqeke zelal nîne û ji bo ku li ser desthilatê bimîne û armancên xwe bi dest bixe her tiştî dike. Di 4'ê Gulana 2022an de, Erdogan plana vegerandina milyonek penaberên Sûrî bo herêma dagirkirî ragihand, ku di rastiyê de ev jî beşek ji nexşeya Mîsaqa Milî ye, ango rastiya peymanê destnîşan dike. Dagirkerî bi riya wê dixwaze plana xwe pêk bîne û herêmê di guhertineke demokrafî re derbas bike.

### Li Başûr jî bi hevkarê PDK'ê planên dagirkeriyê tên meşandin

Li aliyekî din , lê ji bo heman armancê artêşa Tirk li Başûrê Kurdistanê li aliyekî barageh û qereqolan ava dike, li aliyê din bi balafiran êrîşî welatiyên sivîl dike. Helbet ev jî bi hevkariya di navbera Tirkan û PDK'ê de pêk tê. Her roj dewleta Tirk li seranserî Başûrê Kurdistanê ku di serweriya hikûmeta PDK'ê de ye, gelek deveran bombebaran dike û welatiyên sivîl hedef digre, daristan û jîngeha Kurdistanê wêran dike.

Li gorî agahiyên dawî heta niha dewleta Tirk li sinorê parêzgeha Dihok û Hewlêrê 85 baregehên xwe yên leşkerî û îstixbaratî avakiriye. Bi kûrahiya 35-40 kîlometran derbasî nava xaka Başûrê Kurdistanê bûye. Leşkerên Tirk çûnûhatina xelkê gundan li deverê qedexe kiriye û rê li welatiyan digre. Wesayîtên welatiyan kontrol dikin. Rojane bi balefirên bê mirov wesayîtên welatiyan hedef digre. Di van hemû êriş û dagirkeriyan de PDK di aliyê leşkerî, îstixbaratî û madî de hevkariya dewleta tirk dike. Dema dewleta Tirk baregehan ava dike, PDK rê jêre dibe, dema bombebaran dike PDK hedef jêre diyar dike. Dema azadîxwaz tên qetilkirin, PDK zanyariyan bi delweta tirk re parve dike. Li gor amarên fermî ji sala 2015'an ve zêdetirî 160 welatiyên sivîl ên Herêma Kurdistanê di encama êriş û bombebaranên dewleta tirk de şehîd bûne û nêzî 300 kes jî birîndar bûne. Li vir eşkere xuya dike ku PDK'ê bûye amûrê pêkanîna planên dewleta Tirk a dagirker û di nav de pêkanîn Mîsaqa Milî ye.




### Rayedarên Tirk armanac pêkanîna Mîsaqa Milî Eşkre derdixin holê

Tevhiya rayedar ên dewleta Tirk a dagirker eşker behsa armanca xwe ya avakirina osmaniya nû û pêkanînîna mîsdaqa Milî dikin û hin mînakên wê wiha ne:

-Abdullah Gul yekem kes bû ku di sala 1992 de wiha got: "Ez dibînim ku ev nîqaşên li ser têgînan, wek Komara Duyemîn an Împaratoriya Osmanî ya Nû, pir saxlem in.

-Di 24'ê Mijdara 2009 de dema Ahmet Davutoglu bû Wezîrê Karên Derve wiha got: "Mîrateke me ya ji serdema Osmaniyan maye. Ew dibêjin osmaniya nû, erê, em osmaniyên nû ne. Divê em bala xwe bidin welatên herêma xwe û her weha welatên Afrîkaya Bakur".

-Erdogan di 8'ê Tebaxa 2011'an de wiha got: "Sûriye ne mijareke derve ye, belkî em wê weke mijareke navxweyî ya Tirkiyê dibînin".

-Erdogan di 19 Cotmeha 2016 de got: "Dema ku em bûyerên Sûriye û Iraqê dijîn, divê nifşê nû tiştekî baş bizane; Mîsaqa Millî çi ye? Divê em vê yekê baş bizanibin. Eger em li ser Peymana "-Millî lêkolîn bikin û eger em Mîsaqa Millî fam bikin, em berpirsiyariya xwe ya li Sûriye û Iraqê baş fam dikin û eger em bibêjin berpirsiyariya me li Mûsilê heye, wê demê divê em li ser masê bin".

-Erdogan di 11ê Çileya 2018an de got: "Bakurê Sûriyê di nav sînorên Mîsaqa Milî de bû û em rê nadin avakirina saziyeke terorîst li wir»".

- Berdevkê Serokomariya Tirkiyê Îbrahîm Kalîn di 25 Çileya 2019an de got: "Yê ku dîroka nûjen a Tirkiyê dizane, bi zelalî û rast pê dihese ku ewlekariya Tirkiyê'yê ji pişt sînorên Peymana Milî dest pê dike. Divê em ji bo kembera xwe ya ewlehiyê xêzek berfirehtir xêz bikin. Ji ber vê yekê em bala xwe didin Libya".

### Dewleta Tirk guhertina demografîk bi her rêbazî pêk têne

Bi Dewleta Tirk a dagirker bi hincetên cûda beşke mezin ji xaka Sûriyê dagir kir, ji Babê bigre hetanî Ezaz, Cerabils, Idlib, Serêkaniyê û Efrîn dagir kir. Li aliyekî din komên turkmen ava kirine û desrtekê dide wan. Li aliyekî kampên mitîngeriyê ava dike, ji derveyî Sûriyê ixwanan û xelkên welatên din li deverên dagirkirî bi cih dike da ku guhertina demografî pêk bîne.Li aliyê din jî dagirkeriyê dibistanli herêmên dagirkirî vekirin û bi zimanê Tirkî perwerdeyê dide û li gorî armancên dewleta Tirk a dagirker pirtûk dane amadekirin. Li tevahiya dibistanan wêneyên Kemal Atatork û ala Tirkiyê tê hildan.

# Heta ku Rêber Apo azad bibe wê meşa azadiyê bidome

**Navenda Nûçeyan**

Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan "Meşa Dirêj a Azadiyê" ya 25 rojan li banliyoya Villeneuve Saînt Georges a paytexta Fransa Parîsê hatibû destpêkirin, her roj li bajarekî nû pêk tê û meş di roja xwe ya 14'an de berdewamdike. Herwiha li Bakurdê Kurdistanê jî "Meşa Mezin a Azadiyê" ji bona heman mebesê hatibû destpêkirin di roja 4'an de bi coş û kelecaneke mezin berdewam dike.

### 'Tu zext û kuştin nikare me ji rêya me vegerîne'

Hevserokê Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) Berdan Ozturk li wir axivî û wiha got: "Tu zext, binçavkirin û kuştinan nekarî me ji rêya me bikin û dê nekarin jî. Em ji bo jiyaneke bi rûmet têdikoşin. Têkoşîna me ji bo gelên Tirkiyeyê ye. Heta ku pirsgirêka kurd bi rêyên demokratîk neyê çareserkirin dê ev krîz bi dawî nebin. Gel, daxwaza azadiya fîzîkî ya birêz Ocalan dikin. Armanca me jî ev e. Heta ku em vê armancê pêk tînin jî dê meş û têkoşîna me bidome."

Piştre jî girseyê stranên kurdî gotin û xelekên govendê gerandin. Meşa li vê derê bi dirûşma




"Hezar silav ji Îmraliyê re" bi dawî bû.

Meşvan piştre jî derbasî Îdirê bûn. Di ketina bajar de bi dahol, zirne û çepikan hatin pêşwazîkirin. Piştre jî bi dirûşmên "Bê Serok jiyan nabe" û "Hezar silav ji Îmraliyê re" ber bi navenda bajar ve meşiyan. Bi sedan kes tev li meşê bûn. Meşvanên ku ketin Rus Pazariyê, li vir bi coşeke mezin hatin pêşwazîkirin. Girse her ku çû mezintir bû û meş heta pêşiya avahiya partiyê dom kir. Gelan li vir govenda azadiyê gerandin.

### 'Muxatab Abullah Ocalan e'

Hevseroka Giştî ya DBP'ê Çîgdem Kiliçgun Uçar got, "Ev meş meşa me hemûyan e. Îro em bi 38 kesan dimeşin, lê em bi mîlyonan in. Ji her cihê ku em derbas bibin, gel azadiya fîzîkî ya Birêz Ocalan dixwaze. Ev meş wê heta ku Birêz Abdullah Ocalan azad bibe dê bidome"

Uçar, axaftina xwe wiha domand: "Apekî 80 salî ji me re got; 'Em heta qiyametê kurd in.' Pirsgirêka kurd dikare were çareserkirin. Birêz Abdullah Ocalan dibêje 'ez dikarim di hefteyekê de çareser bikim.' Azadiya fîzîkî ya birêz Ocalan mecbûriyeteke. Birêz Ocalan tekane muxatab e. Em li dijî kesên siyaseta mirinê li me ferz dikin têdikoşin. Em spasiya gelên dibin parçeyeke têkoşîna hevpar dikin. Ev meş dê 15 rojan bidome. Her gotina me bila bibe wesîleya aştiyê."

Piştî daxuyaniyê, bi gel re civîn hat lidarxistin. Di civînê de beşên ji parastinên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan hatin xwendin.

### Meşa ji bo azadiya Rêberê Apo meşa fînalê ye

Herwiha ji bo azadiya fîzîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan "Meşa Dirêj a Azadiyê" ya 25 rojan hatibû destpêkirin, her roj li bajarekî nû pêk tê û meş di roja xwe ya 14'an de berdewamdike. Meşa ku li Parîsê destpê kir, wê di 15'ê Sibatê de li Strasbourgê li ber Komîteya Pêşîgirtina li Êşkenceyê ya Konseya Ewropayê (CPT) bi dawî bibe.

Di meşê de bi hezaran belavok ji bo hişyarkirina gelê derdorê hatin belavkirin, esnaf û saziyên Fransî yên li herêmê dosyayên têkildarî şert û mercên tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatin pêşkêşkirin. Koma meşê ya ji 25 kesan pêk tê, di tevahiya meşê de bi coş stran gotin, dostên Kurdan bênavber dirûşmeyên ji bo azadiya Ocalan berz kirin û berxwedana gerîla ya li Zapê ya destanî silav kirin.

Di meşê de ji çalakvan Yakup Çelîk mafê axaftinê girt û berxwedana leheng a gelê Kurd silav kir û got, "Ev meş ji bo azadiya Rêberê me û ji bo me fînalê ye. Divê gelê me yê rêxistinkirî girîngiyê bide vê yekê. Em spasiya hevalên ku di vê rêyê de meşiyane, di serî de meclisa herêmê, berxwedana li zindanan, têkoşîna gerîla ya ku dijmin di tunelan de bin xistiye, dikin."

Qertên di meşê de hatin berhevkirin, ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ê li Îmraliyê di bin pergala îşkenceyê de tê ragirtin hatin şandin.

Meşa ku li Parîsê destpê kir, wê di 15'ê Sibatê de li Strasbourgê li ber Komîteya Pêşîgirtina li Êşkenceyê ya Konseya Ewropayê (CPT) bi dawî bibe.

**FENER**



## Hemû rê diçin Îmraliyê

**Idrîs Henan**

Demeke dirêj e em gotineke navdar dibihîsin ku dibêje; "Hemû rê diçin Romayê" Ev gotin ne tenê li welatê me û herêma Rojhilata Navîna navdar bûye, lê belê li hemû cîhanê navdar e û raza wê xwe disperse bajarê Îtalyayê Romayê ku yek ji bajarên kevnar ê herî xweşik û dîrokî ye.

Sedema vê gotinê jî ew e ku dema Imparatoriya Romayan piraniya cîhanê kontrol dikir û xwest berfirehbûna Imparatoriya xwe biparêze, ji her bajarekî hatibû girtin rêyek asfaltkirî ber bi Romayê diçû ve çêdikir. Ew jî rêbazeke mêtingeriya Romayê bû ku kontrolkirin, misogerkirin, mayîndekirin û dagirkeriya xwe hêsantir dikir. Lew re jî dihat gotin ku tenê rêyên diçûn Romayê asfaltkirî bûn.

Ji xwe di binyada vê gotina navdar de hişmendiya eznavendî ya mêtingeriya global heye. Ango; çarenûsa hemû bajaran bindestiya ji Romayê re bû. Ji ber wê jî girîngiya xwe ya dîrokî û navdarbûna xwe ji naveroka wateya wê ya rasteqîn tê fêmkirin. Di wê manê de dixwest bête zanîn ku hemû encam Roma ye.

Dûrî wateyên dagirkeriyê û çi xweşibandinek bi guman, îroj jî ev gotin bi wateya aşîtî û demokrasiyê manedar bûye.

Tam berovajî pêzanînên mêtingeriyê û hişmendiya serdestiya mutelq, bi şênberiya pêkvejiyanê û bi paradîgmaya azadî û demokrasiyê ya li dijî hişmendiya "Roma" ya zayendperest a wê demê, bi têkoşîna hevpara ya gelan re li Rojhilata Navîn û cîhanê gotina; "Hemû rê diçin Îmraliyê" navdartir bûye.

Îroj çavên gelên Kurdistanê û hemû cîhanê bi slogana "Azadî ji Rêber APO re, Çareseriya siyasî ji pirsgirêka Kurd re" li Îmraliyê ne. Ji çar beşên Kurdistanê û çara aliyên dunyayê gel xwedî li azadiya Rêber APO derdikeve. Fikir û felsefeya wî dixwînin û bi hêza wî ya ramanê rêyên mêtingeriya ber bi "Romaya" nûjen a îroyîn ve diherifînin. Li her derê grevên cihêreng hene. Ji zîndanan, navendên berxwedanê, Kurdistan, Tirkiyê, Ewropa, Afrîqya, Latîn Amerîka û Çiyayên Azad çalakiyên bêserûber hene. Ev çalakî pêl bi pêl li hemû dunyayê bi têkoşîna gelan a ji bo azadî û serfiraziyê, bi hişmendiya xilasker a Netewa Demokratîk rêyên asfaltkirî yên nû ku dûrî hişmendiya eznavendî ne, xêz dikin.

Ev çalakiyên gelan xwedî wê nameya girîng in; "rêya çareseriya mayînd e li Îmraliyê ye. Derveyî wê jî ne gengaz e ti çareseriyên navendî bêtin ferizkirin" Bi gotinek din; "hemû rêyên diçûn Romayê hatin xetimandin û kilîta çareseriyê li Îmraliyê ye".

Rêber APO veguheriye rêberek û sembolek global ê azadî û demokrasiyê. Hemû gelên blindest, azadîhez, demokrasîhez, welatperwer û jiyanhez dilê wan ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber APO lê dide. Hemû çalakiyên li dar dikevin bi awayekî rasterast bersiva komplogeran didin. Aliyek wê jî biryardayîna şikandina deriyên Îmraliyê ye. Wisa jî ji "Romayê" bêtir, bi têkoşîna hevpar a li dijî pergala navendîparêz, cinsiyetparêz a moderniteya kapîtalîst, xwe dîrokî dike. Ji ber ku Rêber APO bi têkoşîna xwe ya li dijî zilm û mêtingeriyê, li dijî qirkirina civakan, li dijî kolekirina jinê, li dijî xesibkirina xwezayê, tola mirovahiyê hildaye. Tola gelê Kurd ku bi sedan sal in di bin destê celadan de dinale, hildaye. Lew re jî, Rêber APO hêzeke fedayî û dîrokî ya tolhildanê ye. Sekin û helwesta wî ya li dijî navenda komplogeriyê, hiştiye ku îroj veguhere navenda hemû rêyên azadî û demokrasiyê. Naveroka nepixandî ya gotina hatiye navdarkirin a "Hemû rê diçin Romayê"

Vala hate derxistin ku "Roma" bi wateya navenda pergala destpotiyê dihate nasîn, lê îroj Îmralî veguheriye navenda hêviya gelan a xilasî û demokrasiyê. Lew re; Hemû rê diçin Îmraliyê.